

Kurdish Weekly Newspaper

Rojnameya Giştî ya Hefteyî
Kurdish weekly newspaper

Hejmar 31 / Sal 1

08.04.2005

Kurdische Wochenzeitung

Papa
Jean
Paul yê
II. çû ser
heqiya
xwe !



Çiya Haco: ciwanek kurd
di qada sportê
ya navneteweyî de



Rûpel 14

Li Amedê Bîranîna şehîdên
Mehabadê Sûç e!..

Rûpel 6

Dr. Xelîl Cindî Raşo û
Xanna Omerxalî
Cejna Sersalê „Çarşemba
Sor,,

Rûpel 8

Ömer ÖZMEN
Patenta Faşizma Tirkan

Rûpel 4

PJK civîna xwe ya 12. li
Osnabruckê pêk tîne

Rûpel 6

Serxwebûna rojnamegerî û
eynika rastiye

Rûpel 5

Bargiranê Omerî
Qeder, neheqî û aqil - I -

Rûpel 15

Sê malbatên Kurd di destê
MHPê de êsîr in

Rûpel 6

Welatperwero bê emsal :
Dr.Xetîp Demiralp

Rûpel 17

Sarican de hezaran bi coş
Newroz firaz kerd

Rûpel 16

Sûriyê diheje!

Di encama çewisandin û tehdîdên hêzên navnetewî de, rejîma Bees ya Sûriyê li aliyekî hêzên xwe yê leşkerî ji Libnanê dikşîne û li aliyê din jî bi armanca haşkirina opozîsyona hundir, girtiyên Kurd berdide û behsa vegerandina nasnameyên 200 hezar Kurdên bê nasname dike.

Peyama Kurd - Ajansa Nûçeyan ya Sûriyê roja 30.03.2005an ragihand ku serokê Sûriyê Beşar Esed biryara berdana 312 Kurdên girtî daye. Girtiyên ku biryara berdana wan hatibû dayîn, di Adara sala 2004an de ji ber bûyerên ku li Qamişlo qewimibûn hatibûn girtin. Li gel berdana girtiyên, rejîma Bees ya Sûriyê dest bi gotûbêja vegerandina nasnameya Kurdên ku berî 42 salan nasnameyên wan hatibûn wergirtin jî kir. Li gel Amerîka, Ewrûpa û hêzên din yê navnetewî, çavê Kurdan jî niha li ser Sûriyê ye. Wê ev dewleta ku bi salane jî aliyê malbatekê ve tê birêvebirin, çiqasî bikaribe li dijî demokratîkkirina Rojhilata Navîn li ber xwe bide? Derketina ji Libnanê, efûkirina girtiyên bûyera Qamişlo û gotûbêjkirina vegerandina nasnameyan, têra dirêjkirina



Rûpel 2-3

na temenê vê rejîmê dike yan na? Gelo rejîma Bees siyaseta xwe ya li hemberî Kurdan diguherîne? Li beramberî

guhertinên ku çêdibin û dibe ku çêbibin, kurd çiqasî amade ne? Tevgera siyasî ya Başûrê Rojavayê Kurdistanê çima

bê helwest e? Siyasetmedar û rewşenbîrên Başûrê Rojavayê Kurdistanê bersiva van pirsan dan Peyama Kurd.

Celal Talebanî serokkomarê Iraqê ye



Rûpel 4

Di roja 6ê Nisanê de Parlamentoya Iraqa Federal sekreterê giştî yê Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê Celal Talebanî wek serokkomarê Iraqê hilbijart. Celal Talebanî kandidatê listeya îtifaqa Kurdistanê bû û di hilbijartinê de 227 ray girt

Xwezî her Kurdekî
xwe nivîskar nedîta!



Rûpel 9

Çarşemba Sor li
Kurdên Êzîdî pîroz
be!

D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1.70 EUR



Akif Hesên	Têmûrê Xelîl	Dewleta Elî	Çeto Omerî
Li Rojhilata Navîn destpêka gujîna bayê demokrasiyê	Demokratî destûr-dayîna her tiştî nîne	Têgeha azadîyê û azadîya jinkê -I-	Damezrêner û serokê PDK-T hiqûqzan FAÎK BÛCAK
Rûpel 3	Rûpel 7	Rûpel 14	Rûpel 10

Berdewama rûpela 2

hisin ku li Sûri hinek kevir ji cihê xwe dilivin lê hina bi temami ranebûne. Berî ku hikûmet dest bi berdana girtiyan bike, wan şandin pey hinek kesayetên Kurd yê bi bandor û naskirî û mûhafîzê Cizirê li gel wan rûnişt û gotinên baş gotin. Wî ji Kurdan re gotibû ev gava yekemîn e, em birayê hev in, gelek kêmanî hene, emê li ser wan bisekinin, em nikarin tevî bi hev re bikin, lê me dest pê kiriye û ewê gelek tiştên baş çêbibin. Ew

Wisa diyar e ku Bees nerîna xwe ya şovenî û bi qirêj ya di derbarê Kurdan de diguherîne

li ser navê Beşar El Esed bi wan re axivî bû. Waliyê Şamê û berpirsyarê partiya Bees yê Şamê çûn serdana girtiyan me yê li Zorava yê ku hatibûn berdan, dibin kon de gotina xwe kirin û hevalên me jî gotina xwe gotin. Dîsa behsa biratî û gavavêtinan kirin. Her wiha xeber şandine ji bo dezgehên nifûsê da ku ew tesbît bikin bê ka çend kes bê nifûs in. Dewletê ev daxwaz kiriye û nav ji wan re hatine şandin. Ev jî hevîyekê çêdike ku nasname li xwediyên wan werin ve-gerandin. Wisa diyar e ku Bees nerîna xwe ya şovenî û bi qirêj ya di derbarê Kurdan de diguherîne. Rejîm pê dihesse ku gelek kertên wê li Libnanê şewitîn. Têkiliyên filehên Libnanê li gel yê Sûri diyar e. Dûrziyên Sûri û Libnanî jî bi hev re ne. Jixwe Exwan El Muslimîn berê li dijî rejîmê ne. Rê li ber wan teng bûye, îcar dixwazin Kurdan bi hinek tiştan has bikin û hinekî bi aliyê xwe ve bixşînin. Lê her ku wan gaveke baş avêt emê spasiya wê gavê bikin û zêdetir bixwazin heta ku pirsgrêka me ya millî di nava Sûriyê de çareser bibe. Bêdengiya tevgera Kurdî li Sûriyê, me tevan dixwe nava fikaran û em pê diêşin. Mixabin em li pey miletê xwe man e. Em dixwazin weke partî pir tiştan bikin. Di dema Newrozê de êriş anîn ser milet, em li hev civiyan û me xwest em weke tevgera Kurdî daxuyaniyekê belav bikin, lê hinekan digotin, çirokeke biçûk e û pêwîstî bi daxuyaniyan tune ye. Me xwest em di 12ê Adarê de herin ser tîrbên Şehîdên xwe, lê hinekan digot, wê rejîm aciz bibe, wê pirsgrêk derkevin, em naçin. Lê em weke partiya Yekîti derketin. Ji bo berdana girtiyan me xwest em konan vekin û bihêlin xelk li hev kom bibe, lê em bi tenê hiştin. Piştî dîtina ku milet kom dibe, xwe tevli me kirin. Em dixwazin tevgera Kurdî tîrsa xwe bixşîne. Zîncira tîrsê ji aliyê xelkê ve hatiye şkehandin, lê ji aliyê gelek rêxistinên Kurdî ve nehatiye şkehandin. Hêvî di ciwanan de ye. Koma ciwanên Kurd heye. Bi awayekî serbixwe kar dikin û piştgiriyê didin rêxistinên ku bi rastî kar dikin. 400 xortên Kurd li gel me hatin serdana tîrbên şehîdan û pêşwaziya girtiyan kirin. Divê em nehêlin ev dema zêrîn di ser me re derbas be.

Meşhel Temo (Nivîskar û endamê Rêxistinên Civakî)



Siyasetmedar û Endamê Civata Sivîl ya Sûriyê


Ji dema ku Bees hatiye ser hikûm û heta niha zindan tije mirov in. Partiya Bees nayê guhertin, lê ew niha mecbûrê serê xwe li hemberî guhertinên ku ji derve ve tînin bitewîne. Rejîma Sûri di serhildana Qamişlo de baş dît ku hêza Kurdî hêzeke hev girtî û bi rêxistî ye. Ew serhildan peyameke baş bû ji bo rejîmê. Ji wan re da nîşandan ku Kurd dikarin di demeke kin de bi milyon dakevin kolanan. Niha dewlet dixwaze ve xelekê bixşîne. Em Kurd û hêzên opozîsyona Erebi nêzîkî hev dibin û me gelek çalakî jî bi hev re kirin. Berdana xortên Kurd siyasetek e. Madem Sûriyê dixwaze gavan biavêje, wê demê çima girtiyan din jî bernade, ma kurd tenê di zindana de ne. Zindan tije siyasetmedar, çalakvanên mafên mirovan û kesên azadîxwaz e. Hinek ji wan ev 20 sal in ku girtî ne. Bi berdana Kurdan bi tenê dewlet dixwaze peyamekê bide me, divê em jî ve peyamê baş şrove bikin. Berdana girtiyan ne çareser kirina pîrsa Kurdî ye. Divê pîrsa Kurdî bi riya gu-

Divê tevgera Kurdî berî partiya Bees xwe biguhere. Partiyên me jî weke partiya Bees ji destpêkê ve û heta niha nehatiye guhertin û herdemê jî aliyê hinek kesên diyar ve hatine birêvebirin.

hertina Destûra Bingehîn çareser bibe. Ji bo vegeandina nasnameya xelkê me yê bê nasname, tê gotin ku ew li navan digerin, ma gelo dewlet nizane ka çend hemwelatîyê wê bê nasname ne û ji mafên xwe bê par in? Ma ev pirsgrêk her û her tune bû? Pêwîstiya wan bi navan tune ye, pêwîstiya wan bi biryareke siyasî û guhertineke bingehîn heye. Tevgera Kurdî jî ne li gor demê ye, siyaseta partiya Bees bandor li wan jî kiriye û ew ne xwediyê helwesteke xurt in. Perçebûna tevgera Kurdî, mijûlbûna wê ya li ser tiştên ne bingehîn, dibe sedema lawazbûna dengê Kurdan. Hêzeke nûjen pêwîste, yê ku hene nikarin xwe biguherin, ev yek di bingeha wan de tune ye. Divê tevgera Kurdî berî partiya Bees xwe biguhere. Partiyên me jî weke partiya Bees ji destpêkê ve û heta niha nehatiye guhertin û herdemê jî aliyê hinek kesên diyar ve hatine birêvebirin. Niha hinek xortên nû radibin û nefesekê didin tevgera Kurdî. Ew roj bi roj difûrin û belav dibin. Hûnê di demeke nêzîk de gelek tiştên nû bibihîzin. Hêviya min bixwe di van xortan de heye, tev zane ne, xwendevan in û tîrsa rejîmê li cem wan tune ye.

Hemîdê Hecî Derwêş (Sero-kê Partiya Demokratî Pêşverû)

Gotûbêja li ser vegeandina nasnameyên Kurdan û berdana gir-



tiyan gaveke baş e. Li gora dîtina min wê nasnameyên xelkê li wan vegeandina. Daxwaza me weke partî ew e ku Sûriyê bi tevayî bibe welatekî demokrat, pîrdengî û pîrhizbî. Ev bingeha her tiştî ye. Heta ku demokrasi çênebe, Ereben dervî partiya Bees û Kurd jî nikarin cihê xwe di nava birêvebiriye de bigrin, pîrsgrêk bi temami çareser nabin. Pêwîste zagonên rewşa awarte rabin, zagonên

Heta ku demokrasi çênebe, Ereben dervî partiya Bees û Kurd jî nikarin cihê xwe di nava birêvebiriye de bigrin, pîrsgrêk bi temami çareser nabin. Pêwîste zagonên rewşa awarte rabin, zagonên pîrhizbîti werin derxistin ku hemû partî bikarin tevli siyasetê bibin.

pîrhizbîti werin derxistin ku hemû partî bikarin tevli siyasetê bibin. Di nava me û opozîsyona Erebi de hevkarîyek heye. Em amadekariya kongreyekî dikin ku em bikarin tê de rewşa dawî li gel van hevkarîyan şrove bikin. Di nava tevgera Kurdî bixwe de jî yekîtiyek heye, lê ne li gora daxwaza ye. Em dixwazin bi programekî nû derkevin pêşberî hikûmetê. Divê em bibêjin ku em van gavan baş dibînin, lê pêwîste ew bi hinek guhertinên din werin temam kirin. Wek nimûne, divê hîlbijartinên azad çêbibin, dawî li desthilatiya yek alî ya partiya Bees were, divê xelkê din jî bibin şîrikê desthilatiyê. Pêwîste zagona partiyên siyasî derkeve, girtî bi temami werin berdan, rewşa awarte nemîne û hêdî hêdî demokrasi were rûniştandin. Divê Kurd weke miletekî bêne qebûl kirin. Lê em herdemê dibêjin, heta ku Sûriyê nebe welatekî demokrat, Kurd jî nikarin bigihîjin mafên xwe.

Kurte-dîroka kiryarên rejîma Bees li dijî Kurdan

Di 23.08.1962an de, Hikûmeta Sûriyê bi derxistina zagona hejmar 93 li Başûrê Rojavayê Kurdistanê, dest bi siyaseteke taybet kir. Li gora zagona nû di 05.10.1962an de di rojekê de serjimartineke awarte li parêzgeha Hesîca hate pêkanin û di encama serjimartinê de ji derdora 120 hezar Kurdî nasname hatin wergirtin û ew ji tevayî mafên xwe yê civakî bê par man. Wan li gel mafê xwe yê hemwelatîyê, mal û milkê xwe jî wenda kirin. Heta niha di derbarê hejmara van Kurdên bê nasname de tu îstadîstîk nehatiye çêkirin, lê li gora rêxistina UNHCR ya Neteweyên Yekbûyî, hejmara wan li derdora 200 hezari ye.

Di gava duwemîn de armanca rejîma Bees, valakirina Kurdistanê bû. Di sala 1973an de wan Kembera Erebi bi dirêjahiya 350 km û bi paniya 15-20 km çêkirin û di encama wê de bi qasî 4000 malbatên Erebi li ci û warên Kurdan hatin bi ci kirin. Navên Erebi li gund, bajar, zar û zêçên Kurdan kirin.

Li Rojhilata Navîn destpêka gujîna bayê demokrasiyê



Akif Hesen

Rojhilata navîn nû dikeve ser otobana demokrasiyê. Piştî ketina Saddam Husên, cara yekemîn e ku rejîmên bi gewdeyên ji kartonê û lingên ji heriya hişkbiyî dilerizin û ji tîrsa ku li ber piya herin, kêferata xelasbûna canê xwe dikin. Çawa bi hilweşandina dîwarê Berlînê re welatên Rojhilatê Ewropa yê mîna xelekên zîncîrê girêdayî Sovyetê jihevketin, îro piştî ketina dîwarê Bexdayê, angos „Berlîna rojhilata navîn“, rejîmên ku ji hevîrê şerê sar hatibûn strandin û heman statû ta îro parast û domandin, rejîmên ku li ser axa fesada civakî, talan û dizî, weşiyet û totalîteriyetê qesr û sarayên xwe avakirine, yek bi yek dihejin. Tim dibêjim di navenda hemû gemar, fen û fitik, fitne û fesadiyê de Sûriyê rûdine. Sûriyê dihele mesela filistinê tim bêcare bimîne; tim tiliya xwe dixwe nav meselên li filistinê û li hev dide ku bêhneke gemar jê were.

Sûriyê nahêle mesela Libnanê were çareser kirin. Sûriyê ye ku serjêkirina insanên, kuştin, lêdan, weşiyeta kor, bê armanc û bê dawî kiriye çanda Rojhilata Navîn. Sûriyê îro nahêle li Iraqê şiddet bi dawî were. Ji ber vê yekê jî zexta dinyayê çiqas li ser Sûriyê zêde bibe, ewqas ew şûnde dikşe. Çiqas Sûriyê şûnde bikişe, xelekên zingargirtî ji hev dikevin û gelên Rojhilata Navîn nefesên demokrasiyê wê bixşînin. Wê demê: Gelê Kurd jî li Sûriyê dikare nefesekê bixşîne û bikeve nava hewldanekê ciddî ji bo statuya xwe ya koletiyê bi dawî bibe. Şert û mercên objektîv êdî gihîştine, tenê tevgera ku ve rewşa nû şrove bike, li gori wê planên nû bipejirîne û çalakiyên nû lidarxîne, pêwîst e. Tê zanîn ku piraniya partiyên me yê Kurdî jî di dema şerê sar de hatine avakirin. Dem di ser wan re derbas bûye, pîr klasîk û tradîsyonel in. Çawa fitne û fesadî bûye çanda rejîmên ereban, wusa bûne çanda van partiyên jî. Ti hêvî di ûslûba tevgera wan de nema ye. Bila kesek xwe nexapîne: ew nedigihên hev, ne dibin enî û ne jî di ve demê de dibin bersiv. Wê demê çi tê xwestin? Têvegera nû, modern û bê kompleks derkeve holê û dest bide partiyên hinek dinamik û birêkûpêk û bi yek dengî hereket bikin.

Patenta Faşizma Tirkan

Ömer ÖZMEN

Di encama hibijartina Iraqê de, dema Kurdan serkeftin bidestxistin û statuya xwe ya federalizmê, di qada navnetevi de dan tescilkirin, politika dewleta Tirkiyê ya Başûrê Kurdistanê jî, pêre iflas kir. Piştê plan û provoqasyonên wan yê jî bo Turkmenan û bêstikrarkirina Iraqê amadekirî, tu encam nedan, Tirk mecbûr man ku, siyaseta xwe ya Başûrê Kurdistanê biguherînin.

Lê ev sekeftinên Kurdistanê Başûr; wek xencerek, di nav dilê statukope-rest û şovenistên Tirk de hat daçikan-din. Ji bo nehezimkirina serkeftinên Kurdan, pêlên faşizmê û çalakiyên provoqatîf, di raya giştîya navxweyî de ketin rojevê. Hefteyek berya Newrozê, di çapemeniya Tirk de, zêde-firotina pirtûka Adolf Hitler, ya bi navê „Cenga min“ (Kavgam), bi taybetî dihat nîqaşkirin. Di van nîqaşan de, gelê Kurd; wek Cihûyên di dema Hitler de, êşkere dihat nîrxandin. Profesore Faşist Ümit Özdag, di rojnama „Akşam“ê, hejmara 04.03.2005 an de, destkeftinên Kurdistanê Başûr û zêde-dewlemendbûna Kurdên Bakur, wekî sedema pirtûkê Hitler dida xuyakirin û weha dinivîst: Hitler, ji boranê Cihû berpirsiyar didît. Zêde dewlemendbûna Cihûyan, ji terefê hinek Almanên baş ve nedihat hezimkirin. Ev roj jî, yê pirtûka Hitler dixwînin, Tirkên başin, û di bawerîya jîpaşdexencerkirina xweda ne.

Ev nijadperestê segbav, êşkere sistema faşizmê û qetilkirina Cihûyan diparêze û pêşniyara komkujîya Kurdan tîne zimên. Tu dozgerê Tirk, di derheqê vî sûcê li dij mirovahiyê, doz venekiriye.

Tê zanîn, Ümit Özdag, di pirsgerê Kurd de, şewirmendê serfermandariya Tirk e. Li ser navê dewleta Tirk, beşdarî gelek konferansên navnetewî bûye.

Rojnamevanê Tirk Hasan Cemal, li ser van hewildanên faşistên Tirk, rexnên xwe rêz dike û ji bo faşistbûna dewleta Tirk, nîrxandinek balkêş, ji akademîsyen Türker Alkan girtiye nav nivîsa xwe. Min, sernivîsa vê meqalê, ji nîrxandina Türker Alkan bijartîye. Ez dixwazim wek orijînalê wê, bizivîrinim Kurdî.

“Pirtûka Hitler pir tê firotan. Ne hewceye ku, em kabûs bibînin û bêjin “Gelo me ferq nekiriye ku em dibin faşist. Ger faşizm were gel me, ne bi rê ya Hitler ve, ne jî, ji pirtûka “Kavgam” ve tê. Ji xwe kulturek me ya faşizan, li gorî me heye. Ez bawer nakim ku ji bo viya jî, em hewcebin ji Almanan alikariya teknîkî bistînin. Faşizma me, besî meye..


Ew kesên; li Meraşê serî jê dikirin, li Sêwazê meriv dişewitandin, di xanî û baxçên tevî zarukên xwe tê de rûdiniştin veguherandibun gorê, bi biryara meclîsa malbatî ewladê xwe qetildikirin, di girtigehan de li mirovan êşkence dikirin, û bi milyon kesan jî alîkarê wan hebûn. Hûn bawerî ku ev kesana pirtûka Hitler ya bi navê “Kavgam” xwendibin û heyranê Hitler bimînin! Tucarî na. Piraniya van kesan, di jiyana xwede pirtûk mirtûk jî nexwendine.

Belkî jî Faşizm hilberîna me ya malxweyî ye. Patenta wê aîdê me ye. Gicir, gicir.

Ez beşdarî vê nîrxandinê dibim. Spasî Türker Alkan (Hasan Cemal-Milliyet-22.03.2005). Ji bo van tespîten rasteqîn, ji Hasan Cemal û Türker Alkan re, sed carî spasî.

Ma qey, ji bo çî Musollîni, di axaftinek xwe de gotiye „Yekemîn şagirtê Mîstefa Kemal Adolf Hitler e, yê duyemîn jî ez im“

Celal Talebanî serokê Dewleta Federal ya Iraqê ye



Bexda- Di roja 6ê Nîsanê de Parlamantoya Iraqê Federal îro sekreterê giştî yê Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê Celal Talebanî wek serokkomarê Iraqê hilbijart. Celal Talebanî kandidatê listeya îtifaqa Kurdistanê bû û di hilbijartinê de 227 rey girt.

Adil Abdul Mehdi, nûnerê Erebên Şîî, û Xazî el Yawer, nûnerê Erebên Sunnî jî wek cihgirên serokkomar hatin hilbijartin.

Di dîroka Iraqê de yekem care ku serokkomarê bi hilbijartinê demokratîk tê tesbît kirin û serokkomar dibe yekî Kurd.

Hilbijartina Celal Talebanî wek serokkomar ji bo Kurdan û ji bo Iraqê federal a ya pîrmiletî û pîrrengî serkeftinek mezin e. Ev her wiha nîşana wê yekê ku hêzên demokrasîxwaz li Iraqê gavên nûn ber bi avabûnê ve davêjin.

Serokê Partiya Demokrat ya Kurdistanê Mesûd Barzanî bi awayekî pir xurt piştigiriya Celal Talebanî kir. Mesûd Barzanî xwe nekîr kandidat û Kurdan bi yek dengî Celal Talebanî jî bo serokkomariya Iraqê kirin namzet.


Piştî hilbijartinê 30-ê meha yekê Erebên Iraqê nedixwestin ku Kurdek bibe serokkomarê Iraqê û lewra jî danûstandinên di navbera Kurdan û Erebên demokrasîyê girt. Lê listeya hevbeş a Kurdan li ser daxwazên bi îsrar sekîni, Polîtîkvanên Kurd, di serî de Mesûd Barzanî di beyanên xwe de gotin “ Kurdek yan wê bibe Serokkomar yan jî Serokwezîr û kandidatê Kurdan jî Celal Talebanî ye”.

Listeya Kurdan ya hevbeş di Parlamantoya Iraqê de bi 77 parlamenteran tê temsilkirin.

Celal Talebanî piştî hilbijartinê di Parlamantoya Federal ya Iraqê de axaftinek kir. Serokkomarê Iraqê Federal Celal Talebanî di axaftina xwe de “ez serokê gelên Ereb, Kurd, Turkmen û Asurî û bawermendên Şîî, Sunnî, mesîhî û Ezîdî û hemû Iraqîyan im” got û axaftina xwe wisa ajot: “ Ezê ji bo Iraqê demokratîk, federal û parlamenter tîbikoşim. Emê hewl bidin ku li welatê me aşîf

û aramî pêk bê, teror û rişwet ji ortê rabe. Emê bi dinyaya îslamî û rojava ve pêwendiyên xwe xurt bikin. Emê zagona bingehîna ku Iraqê demokratîk, federal û plural garantî bike, wek zagona dewletê çê bikin.”

Celal Talebanî kî ye?



Celal Talebanî di sala 1933 de li başûrê Kurdistanê li gundekî girêdayî Dokanê jî dayîk bû. Xwendina xwe ya destpêkê û navîn li Koy-sinceq û ya

lîseyê li Hewlêr û Kerkûkê qedand. Talebanî di ciwaniya xwe de beşdarî xebata siyasî bûye, ew di sala 1951ê wek endamê Komîteya Navendî ya PDK hate hilbijartin.

Di 1953 de wî li zanîngeha Bexdayê dest bi xwendina hiqûqê kir û ligel hinek hevalên xwe yê xwendekar bi awayekî dizî Yekîtiya xwendekarên Kurdistanê damezirand. Di sala 1956 de ji ber xebata xwe ya siyasî dest ji xwendinê berda. Sala 1961 ligel Mele Mistefa Barzanî dest bi şerê çekdarî kir. Piştê ji ber cudabûna bîr û baweriyên siyasî di navbera wî û Mele Mistefa de di 1964 de ji PDK cuda bû û Partiya Şoreşgerî ya Kurdistanê damezirand.

Di sala 1970 de piştî peymanê 11 Adarê careke din li Mele Mistefa vegeriya.

Piştî tîkçûna Peymana 11 Adarê di navbera Kurdan û hikûmeta Iraqê de di sala 1975 de, Talebanî sala 1975 Yekîtiya Niştîmanî Kurdistanê ava kir.

Celal Talebanî bi keça nivîskarê navdar Îbrahîm Ehmed bi Hêro Xanim re zewicî ye. Talebanî bi hunera xwe ya dîplomasiyê nasdar e.

Bibe aboneya/ê Peyama Kurd

Nav / Paşnav:

Navnîşan:

USA, Kanada û Austuraliya

6 mehan: 70, €

Salekê: 120, €

Welatên Yekîtiya Ewropa

6 mehan: 60,00 €

Salekê: 90,00 €

Almanya:

6 mehan: 50,00 €

Salekê: 70,00 €

Commerzbank Bonn

V. Efe/Peyama Kurd

Konto: 1007947

BLZ: 38040007

Konto:

V. Efe/Peyama Kurd

IBAN: DE38 3804 0007 0100 7947 00

BIC: COBADEFFXXX

Ji bo welatên din tîkiliyê bi rojnemayê re deynin.

Peyama Kurd, Thomas-Mann-Str. 22, 53111 Bonn, Germany

Tel.: +49 (228) 18 00 654 - 18 00 655, Faks: +49 (228) 18 00 656

www.peyama-kurd.com, eMail: info@peyama-kurd.com

Di Newrozê de du al!



Rêber Mihemed

Mesûd Barzanî di rojên Newrozê de got : Em Alâ Iraqê li ser axa Kürdistanê bilind nakin , ji ber ku sembola nexweşî, talankirin û kuştina 8 000 Barzanîyan e, 182 000 Kurdên li Enfiala bê ser û şonin, 5 000 zarok, pîr, jin û ciwanên Kurdin li Helebçeyê û ev di jiyana Kurda de sembolek reş e, jiber van sedeman ji em Alâ Iraqê li ser Axa Kürdistanê bilind nakin .

Li Kürdistanî Tirkî, Serokê Dehapê (Tuncer Bakirhan) got : Alâ Tirkîyê Alâ Kurdane jî. Ev herdu fikrên cuda yek Alâ dijminê Kurda li ser Axa Kürdistanê qebûl nake , û yek jî Alâ dijminê Kurda li ser Axa Kürdistanê qebûl dike, dixwaze Kurd jî wê Alê qebûl bikin û di bin vê Alê de bimînin. Ji xwe ne hewceye mirov li ser Alâ Kemalîstan bifikire ka ya kê ye. Zarokên Kürdistanê jî dizanin ew Alâ Tirkî ye û ew Al jî Alâ Seddam Hissên reştir e, lê serokê Dehapê (Tuncer Bakirhan) heger piçek aqilbe vê gotinê nabêje (heger Kurd be). Ma kengî Kurda Alâ Kemalîstan bilind kirîye, ma di Koma-

ra Mihabatê de Kurd bê Al bûn, ma Alâ di Parlementuya Kürdistanî Iraqê de ne Alâ Kurdaye, yan Tuncer Bakirhan, dinyayê li ber cavê xwe nabîne û ji bû çî evqas bi erzani diaxive? Tirka bi tang û topan ev Alâ reş bi Kurda nedaye qebûl kirin, heger Alâ Tirkî Alâ Kurda be, ji bû çî Kurda evqas şer kirin û evqas şehîd dan, hetanî Tuncer Bakirhan bêje: Alâ Tirkî alâ Kurdaye jî !? Ji xwe berê jî Ehmed Necdet Sezer gotîye: Her kesê ku li Tirkî dijî Tirk e. Û Tirk hebûna Kurda jî binî qebûl nakin

AlâTirkî ku Tuncer dibêje Alâ Kurdaye jî , çawanê ve Alê Namûs û şerefa Kurda li ber linga avêt , çawanê malek li nehêla û ne girîyand, ew Alâ pêl hemî pîrensipên Insanî û Ilahî kirî Alâ Kemalîsta ye alâ Tirkî ye. Tuncer Efendî! Heçiyê kevîrekî bavêje dîroka xwe û rastîya milletê xwe , wê pêşeroj tehtekê bi serde bine xwarê! Tuncer efendî! Heger raste tu Kurdî, tê lêbûrinê ji Milletê Kurd bixwazî!

Serdozgeriya Amedê dozeke nû li endamên JITEMê vekir

Piştî ku endamê JITEMê Abdulkadir Aygan li kiryarên xwe yên hovane mikur hat, pîrsgirêka cîneyetên „kujer ne diyar“ ketin rojeva Tirkîyê û rêxistinên mafên mirovan

PK-AMED

Piştî ku endamê JITEMê Abdulkadir Aygan li kiryarên xwe yên hovane mikur hat, pîrsgirêka cîneyetên „kujer ne diyar“ ketin rojeva Tirkîyê û rêxistinên mafên mirovan. Li gora ku tê ragihandin, kiryarên JITEMê yên tarî ne îro, lê belê berî 7 salan ji bo Dadgeha Cezayê Giran ya Amedê hatine ragihandin.

Tê gotin ku agahdariyên di derbarê JITEMê de ji aliyê Hecî Hesenê ku bi nasnameya İbrahim Babat tê naskirin, hatine ragihandin.

İtırakarê bi navê Hesen di encama birîndarkirina mirovekî de tê girtin û 17 sal cezayê hepsê lê tê birîn, wê demê ew mecbûr dimîne ku nameya mikurhatinê ji Desteya Lékolinê ya Serokwezaretîyê re bişîne.

Piştî nameya Hecî Hesen, Serdozgerî di derbarê wî, Adil Timûrtaş, Recep Tîril, Aygan û komek kujerên din de dozê vedike.

Dadgehkirina kujeran bê encam

berdewam dike û piştî ku vê dawiyê Aygan jî li kiryarên xwe mikur tê, dozgerî gotinên wî û Hecî Hesen dide ber hev û digihîje encama dadgehkirina wan. Serdozgerê Komarê yê Amedê Mîthat Ozcan di derbarê A.Aygan, Hecî Hesen, Abdulkarim Kirca (Bînbaşiyê teqawîtbûyî), Mehmûd Yıldırım (Yeşil) û çar kesên din de jî dozê nû vekir.

Çavê kesên ku xizmên wan ji aliyê JITEMê ve hatibûn kuştin û revandin niha li vê dozê ye. Ew hevî dikin ku di encama vê dozê de aqûbeta xizm û nasên wan û rûpeleke reş ji dîroka Dewleta Tarî zelal bibe. Weke tê zanîn Bînbaşiyê teqawîtbûyî û serkêşê koma kujeran Abdulkarim Kirca weke berdêla xizmeta ku ji dewletê re kiribû, ji aliyê Serokkomarê berê Silêman Demîrel ve bi Medalya Şanaziyê ya Dewletê hatibû xelat kirin.

Serxwebûna rojnamegerî û eynika rastiyê

Kadim Kan

Gelek caran bê munaqêşe li ser tê lihevkerin ku , rojnameger gereke karibe di navbera xwe , bûyer û ewê ku bi bûyerê ve girêdayîne mesafekê bihêle û bi vî awayî qewmandinê bigihîjîne xwendevanan.


Lê belê qedr û qiymeta dîtinek weha lîberal di pêvajoya ragihandinê de tune. Ne ku ne ehlaqîye û ne raste, di tebieta formasiyona civakî de ew dar bi hêsanî şîn nabe.

Çima ?

Li cihanê hemû dezgeh û hêzên ragihandinê aidê netewekê, çinekê, cinsekî, komikê an di bin bandora îdeolojiyek, an komikê aborî da ne. Lewra rojname û rojnameger aligir e... Lê faktorek girîng heye ku gerek neyê ji bîr kirin. Di çapemeniyek demokratîk de bûyer û pîrsgirêk ji gelek aliyan-aspektan dighînin xwendevanan û xwendevan terciha xwe bixwe dikin. Bi ya me be yan ne bi ya me be. Bi dilê me be yan ne bi dilê me be , rojnamegerî di navbera qewmandin û xwendevan de ne têla elektrîkê ye.

Gelek caran di pêvajoya gihiştina agahdariyan de, kê an zêde, xwendevan di bin neçare parzûna-safoka ramanê ku ew dinivîsîne de ye. Bi gelemperî rojnamegerî li cihanê bi vî awayî diherike. Lê di nav me Kurdan de rojnamegerî jî ber weşna me ya taybetî, hinek xisûsiyetên xwe hene. Hema bêjin nûçe hemî li ser kirinên dagirkeran û evên ku avê dikşinin aşê dagirkeran ye . Ji ber ku Kürdistanî Bakur di pêvajoyek bi îdeolojî, bi politîk û kultura Kurdî de li ber fetisandinê ye, nûçên ji Kürdistanî Başûr wek bayê zozanan dilê me xweş dike .

Di derbarê herikandina agahdariyan



de carna merov di nav qelebalixan, bê îstikametiyan û di bê çapiya ramanan de bêhteng dibe û xelesa rast û nerastiyê dikevin nav hevdu .

Bê terefi, rastî û tenê rastî, lê kî eynika rastiyê ye?

Rastî ne malê bavê kesî ye, lê herkes dixwaze temsiliya wî bike. Wek nimûne:

Kürdistan mêtîngehe eva rastîya kê ye? Ma partî û kesên ku dixwazin Kürdistan azad bibe temsiliya wê rastîye dikin?

Pîrsgirêk ewe ku di gengeşîya temsîlkirina rastiyê de heqê kê heye?

Gelek balkêşe ku hinek alî hem rastiyê, yanî hebûna Kürdistan û Kürdîbûnê, wek xak, dîrok û hêjayiyen me dejenere û inkar dikin û hem jî dixwazin temsiliya rastiyê bikin.

Di eynî qonaxê de du dîtînen jî hevdû dîr.

Ji alîkî ve bi mehan bi behsa mîtoljiya Yûnani rojev hat tîjî kirin. Piştî dora azadiya jin û cinsiyeta wan hat û ku çawa Kürdistan bûye „kerxane. Dûvre „demokratîkkirina Komara Tirkî“ ket rojevê. Mesûl û rêberên wî ji nişkave gotin „em Tirk gelek mêvanperwerin“ û evên ku „Federasyona Kurdan ava dikin xayîn in“ niha jî li holê konfederasyona gom, tax, gund û bajarên Kürdistanê heye.

Bê ehlaqîya herî paşin jî eve ku dibêjin „alâ Tirkî alâ Kurda“ ye

Ji aliyê din ve, li paytexta Tirkî serokê Kurd dibêje ku „kerkûk dilê Kürdistanê ye“ û di peyde „Kürdistan wê rojek bibe serbixwe“ û tê berdewamkirin „Alâ baasiyan wê tucarî li Kürdistanê neyê daliqandin“

Baş e, rojnamegerên ku xwedî wîjdan û ji bo xwe dibêjin Kurdeker û Kürdistanî, wê çawa van nûçan bi rîsm û bi şirove li pelê xwe nexe?

Dengê Orhan Pamuk jî birîn

PK-Navenda Nûçeyan

Orhan Pamuk di daxuyaniyekê de ji bo rojnameya Britanî The Times, diyar kir ku ewê êdî di derheqa Tirkîyê de neaxife. Ji ber ku daxuyaniya Pamuk ya ku gotibû, „Tirkîyê 30 hezar Kurd û milyonek Ermeni kuştîye“ li Tirkîyê dengê mezîna da û bû sedema tehdît û şantajên li navçeyekê bu sedema gotûbêjîkirina şewitandina berhemên wî, Pamuk gava xwe bi paş de avêt. Nivîskarê The Times Jason Goodwin wiha dinivîsîne: „Orhan Pamuk dibêje, êdî dawî li dema axaftina ji bo Tirkîyê hatiye û wexta vegotina çîrokên



min e.“

Bi vî awayî Tirkîyê hêviya rewsenbîrekî din jî şikand û biryara ku di derheqa pêşeroja

welatê xwe de neaxife pê da girtin.

Ala Tirk û şîrîkatî!

M. Şerif MÜŞTAK

Dewleta Tirk bi fermî inkarkirin pejirandî ye. Li gor nêrîna fermî yek netewe, yek al û yek welat e. Ji wê sedemê netewe û kêmaneteweyên di nav sînorên mîsaqê millî de nayên pejirandin, herkes Tirk e. Nete-
weyên ko di nav sînorên mîsaqê millî de dijîn ko bivîn û nevin Ala Tirk wan temsîl dike, kesên di Tirkîye de dijîn Tirk in. Bi taybet dewleta Tirk ji bo gelê Kurd serobino bike ev politîka li diji ilim û insanîyetê weke perspektîfên dewletî dane pêş, bi wê sedemê dirokek sale Kurda dide qetilkirin.

Al bi xwe çîye? Al ji bo dewletekê, yekîtîya neteweyî û millî temsîl dike.

Di nav sînorên dewletekê de, di destûra dewletê de wekhevîti nebe, Al çawa dibe sembola yekîtîya wan netewe û kêmaneteweyên di wê dewletê de dijîn?

Divê destûra bingehîn a dewletê bi fermî tevayên mafê siyasî, ekonomî, kulturî, zimanê dayîk û bavê weke hev pejirandibe, li gor destûra esasî herkes weke hev xwedîyê mafê be, hemu netewe herêmên ko bi bêhtirîn lê dijîn zimanê wan bi fermî yekemîn be. Lê nexwe, Ala wê dewletê nikarin wan neteweyan di nav sînorên wê dewletê de temsîl bike.

Netewe û kêmaneteweyên di nav sînorên mîsaqê millî de dijîn di destûra esasî a dewletê de ne weke hevîn. Herkes mecbûre ko Tirk be û bi Tirkî bixive.

Zarokên dibistana her sibeh di dibistanê de gava bibêjin "Tirkim, rastîyê dibêjim, jêhatîme..." dê mejî hînî Tirkîyê bibe. Ev siyaseta fermî a dewleta dagirker e. Kesên ko ne Tirk, gava bi xwe dihisin, dizanin ko dewlet ne dewleta wa ye û Al ne Ala waye.

Iro di nav sînorên mîsaqê millî de gelê Kurdistanê ji hemu mafê xwe ê siyasî, kulturî, insanî û ekonomî bi destûra esasî a dewletê bê pare. Gelê Kurdistan weke şîrîkê dewletê nayê pejirandin. Tirko her wextî Kurd qetilkirine, zêndan kirine, sirgûn kirine û mecbûrî penabirîyê kirine. Ala dewletê bûwe sembola dagirkerî û tehdîda li ser gelê Kurd. Ala Tirk ticara nebûwe Ala Kurda. Al bi fermî a gelê Tirk bi tenê



hatiye pejirandin.

Dirokek sale Tirko xwe bi qetilkirina Kurda dipesînîne, nav di xwe dide.

Dagirkerî û inkar ji bo li ser linga bi sekine, li hember gelê Kurd şowenîzm bi rêya Erkanê Herb û berpirsiyariya dewletê ve tê meşandin.

Ji bo gelê Kurd şîrîkê dewletê be, dive bi fermî biqasî Tirka di dewletê de xwedî maf be. Dera ko coxrafiya Kurdistan û gelê Kurd bêhtir lê dijîn, divê zimanê Kurdî li ser wê coxrafiya Kurdistan zimanê fermî ê yekemîn be. Zimanê Tirkî li Kurdistanê û zimanê Kurdî li Anatolyayê bi fermî zimanê didowan bin.

Dewlet bi navê Tirka hatiye bi navkirin. Tirka bi tena xwe rengê xwe li ala xwe kirine. Di bin Ala îro de bi sedhezara Kurd hatine Kuştin. Divê Kurd û Tirk bi hev re navekî nû li dewletê bikin, Al kesk, sor, zer û sipî be. Sor û sipî di ala Tirka de jî heye, ji xwe kesk û zer rengê Kurd in. Li gor dewleta Tirk, Ala Tirk rengê xwe ji xwîne standiye. Xwîna ko hatî rijandin bêhtirê wê a gelê Kurdistan e. Bi van sedeman dewleta Tirk û Ala Tirk bi rewşa îro ticara nabin a gelê Kurd û Kurdistanê.

Bi taybet ji wexta Imralî ketî bin qontrola dewletê û virde, şowenîzma dewletê zêdetir bûwe. Waweyla ko Tirk ji bo Alê dertêxin, aliyek jê girêdayî bi Imralî ve ye. Ji roja ko PKK derket û heya niha rûmet nedane Ala neteweyî û millî a gelê Kurd. Ala PKK weke Ala gelê Kurd datînin ber çavê gel. Têkiliyên Imralî û dewletê, dixwazin Ala Tirk bi gelê Kurdistanê şêrin bikin. Cuwan Haco ko gotiye "Ala Tirka a Kurda ye jî" parçek ji proxrama di nav dewletê û Imralî deye. C.Haco wergera vê dike û nikare xizîkê bide ser pera jî. Ev gava hanê, ji bo rûmetgirtina Ala Tirk li Kurdistanê çêbibe, hatiye avêtin.

Ji bo ko gelê Kurd bibe şîrîkê dewletê û Ala dewletê, divê ji nûve Kurd û Tirk li hev rûnin. Ji bo dewletê bi fermî naveke nû bidin nîqaş kirin û Aleke nû bê neqîşandin. Wê wextê gelê Kurd wê bibe şîrîkê dewletê û Ala dewletê. Hingî ko Kurd xwe ji bo wê dewletê û Ala wê dewletê bidin kûştin rast e!

Şerif.muestak@gmx.de

PJK civîna xwe ya 12. li Osnabruckê pêk tîne

PK - Di sala 1994 an de ji çar parçên Kurdistanê jinên Kurd hatin ba hev û li ser pirsên xwe gengeşî kirin.

Li vir bi navê „Platforma Jinên Kurd“ Platformek serbixwe hat damezirandin.

Jinên ku di Platformê de cih digrin xwedî dîtînen cûrbecûr in.

Îsal sala 11.mîn a damezirandina PJK ye.

Îsal jî PJK cara 12.mîn li bajarê Almanya Osnabruckê civînek amade kiriye.

Babetên civîne:

1- Nexweşiyên Psikomatîk û sebebên wan

2 - Pêşketînen polîtîk li Kurdistanê Başûr

3- Babetên din ku di civîne de bikaribin bînin tesbît kirin.

Ji kerema xwe heta 10ê Nisanê me agahdar bikin.


Civîn roja 14ê Meha Gulanê, sehet di 10:00 de destpêkî û heta roja Duşemê piştî nîvro didome.

Not : Yên ku mecbûrin zarokên xwe bi xwe re binin, ji kerema xwe berê xeberê bidin me. Miqatebûna zarokan bi peran e.

Bîha: Hemû hevra 60 € ye.

Tel: 00 49 (0) 541 66 87 684

Li Amedê Bîranîna şehîdên Mehabadê Sûç e!..



Mihemed Eren/Amed

Li Amedê ji bo bîranîna şehîdên Mehabadê civînek çêbû. Piştî civîne derheqê kesên ku axifîne de doz hatiye vekirin. Li ser daxwaza serdozgerê Amedê, ji bo

li muduriyeta ewlekariyê ifade bidin, bang li 11 kesan hat kirin. Di nav van kesan de birêvebirên KURD-DERê jî hene.

Di roja 03 Nisan 2005î de li salona konferansê ya Şaredariya Baxlarê de ji aliyê KURD-DERê ve civînek ji bo şehîdên Komara Mehabadê hatibû bidarxistin. Li ser îdiayên dozger, di wê civîne de ji bo çareserkirina pîrsa kurdî, bi awayeke fermî nasandina ziman û çanda kurdî axaftin hatine kirin û ji ber wê yekê roja 4ê Nisana 2005î de ji bo îfade-dayîne bang li van kesan ku civîne bidarxistine hatiye kirin.

Di nav kesên ku civîne bidarxistine de birêvebirên KURD-DERê İbrahim Guçlu, Arjen Arî û Sedat UGUR hatine binçavkirin.

Ji bilî van kesan ji bona îfade-dayîne bang li 8 kesên din jî hat kirin ku di nav wan de serokê HAK-PARê yê şaxa Amedê Halis Nezan, parêzer Sabahattin Korkmaz û nivîskar Recep Dildar heye.

Sê malbatên Kurd di destê MHPê de êsîr in



PK navenda nuçeyan - Me di hejmara berê ya Peyama Kurd de, ji devê siyasemedarên Kurd armanca provakasyona alê diyar kiribû. Bê guman e ku armanca wê listokê, bilindkirina nijadperestîya Tirk û çavtirsandina Kurdan bû. Dewlet dixwaze siyaseta xwe ya diroki careke din dúbare bike û bi derxistina tevliheviyê civakî fermî Kurdan rake. Deng û rengê wê siyaseta hêdî hêdî diyar dibe. Li gelek bajarên Tirkîyê êrîş diçin ser Kurdan, heqaret li wan dibe, tene lédan û rayedarên dewletê jî temaşe di-kin.

Niha ji li Konyayê li navçeya Çumra mal û dikanên kurdan ji aliyên nijadperestên MHPyî ve hatine dorpeçkirin. 3 malbatên Kurd bi rojane ku nikarin ji bo pêwîstiyên xwe yê jiyane jî malên xwe derkevin. Li ser wê yekê Komeleya Mafên Mirovan (IHD) û Mazlum-Derê heyet şandin Çumrayê. Serokê Giştî yê IHDê Yusuf Alataş, di derbarê bûy-

erê de daxuyaniyek da û got ku piştî agahdarî gihîştine destê wan, wan bi Qeymeqam Osman Taştan re hevdiin çekiriye. Alataş, da zanîn ku malbatên kurd nikarin ji malên xwe derkevin û li hêviya ewlekariyê ne. Alataş, da zanîn ku Qeymeqam ji wan re gotiye „Serî li dozgeriyê bidin. Tişteki ku ez bikim tune ye. Bi daxwaznameyê serî li dozgeriyê bidin. Serlédan bi telefonê nabe“. Li gora Qeymeqam bûyer ne hêjayî mezin-kirine ye, lê belê camên mal û dikanên van malbatan hatine şandin, ew hatine tehdît kirin û zarokên wan nikarin herin dibistanê. Piştî ku heyeta mafên mirovan ji bajar derketiye, malbatên Kurd telefoni wan kirine û gotine ku nijadperestên MHP yî li 3 kesan dane.

Wê piştî navçeya Çumra dora kujan gund û bajarî de kes nizane. Li hemberî êrîşên ku çêdibin, heta niha helwesteke tûnd jî aliyê dewletê û rêxistinên civakî ve nehatiye nişandan.

Demokratî destûrdayîna her tiştî nîne

Pêşketinâtêknîkêlihemû cihanê gerekê alikariya pêşketina merivayê bike, jiyana kesên hewaskartir bike û zanebûnên wan zêdetir bike. Di hêla rojnamevanîyê, edebiyetê û çandê da teknîka Înternêti gerekê bibe bingeheke girîng ji bo peydabûna berhemên bi dereca bilind.


Wek gelek ronakbîrên milletên cihanê, ronakbîrên kurdan jî, piranî yê li welatên Awropayê, destpê kirin ji wê teknîkê karê kevin, xwesma ronakbîrên ku bi karê nivîskariyê û rojnamevanîyê va giro ne. Demokratiya li welatên Awropayê, siyaseta wan ya merivhiyê hindava nonerên wan gelan da, ku li welatên wan da mihacir in û dixwezîna kûltûra xwe pêşda bibin, xwesma nonerên wan miletan, ku li welatên wan da hemû cûre asteng hatine sazîkirinê bona berbendkirina pêşketina çand û edebiyeta wan, rêyên fire û ronahî vekirine.

Niha em mêze bikin çika em - kurd, ji wê teknîkê û demokratiyayê, ji imkanên li Awropayê heyî ji çî û çawa karê dikevin. Ez ji serê sêrî da bêjim, ku ji wan miletên Rohilata Navîn, ku destbi karê bikaranîna çapemenîya li Înternêti kirine, kurd yek ji wan miletan e, ku karê xwe bi serketî pêşda dibe. Ezê di vê nivîsê da nimûna kar û barên çend kovarên kurdî binim, ku ji wan ra "Kovarên Înternêti" dibêjin. Û ezê ji her yekê nimûneyan binim, kêmasiyên wan (ew tenê bi ba-

weriya min kêmasî ne) binim ber çavan. Lê ew nayê wê manê, ku tenê kêmasiyên wan kovaran hene. Eksi wê: xizmeta wan ji bo pêşketina çand û edebiyeta me ji kêmasiyên gelek zêdetir e û ez bi xwe ji wê xizmetê karê ketime, û ev nivîs tenê daxazek e, ku ew xizmet zêdetir, paqijtir û ya here girîng jî, profesyonel-tir be.

Lê berî ku ez derbazî tîma xwe ya sereke bibim, dixwezim çend tiştên girîng destnîşan bikim, ku bîy wana pêşketina çand û edebiyeta kurdî (ne tenê ya kurdî) nikare baş bi ser keve.

Berî bikaranîna van îmkanan, li Awropayê îmkaneke ji wan girîngtir heye, ku kurd baş bi kar naynin. Ew jî îmkana xwendinê ye, xwesma xwendina li Ûnîversîtetan. Ji ber wê jî di gelek helbestan da poesî tune, di dersdayînê da pêdagogî tune, di gotaran da rojnamevanî (jûrnalistîk) tune. Kêmasiyêke din jî ew e, ku li ser van rojname û kovaran, li ser çapbûna pirtûkan hiç cûre kontrol tune. Li her deran berî ku nivîsa yekî çap bikin, xwediyê nivîsê kî dibe bila bibe, rêdaksyona weşanê biryara çapkirin an çapnekirinê dide. Ji ber ku eger di gotarê yekî da şaşî hebe, bi xwediyê nivîsê ra tevayî gunehkarî dikeve li ser wê weşanê jî. Wek ku her kes zane, di dawîya her rojnameyekê an jî kovarekê da navê rêdaktor an jî rêdaksyonê tê nivîsar. Ew îmze ye, ango rêdaktor an jî rêdaksyon di bin hemû



Têmurê Xelîl

nivîsan da îmza xwe davêjin, ku di weşana wan da çap bûne. Tê bîra min, ku "Rya teze" miqala profesorekî navdar çap nekir û me jê ra got, ku di hêla pêşekê (profesîya) xwe da ew profesor e, lê di hêla rojnamevanîyê da ew pêxas e û wî jî qebûl kir.

Eger weşanek şaşiyêke siyasî çap bike, an jî neheqî li kesekî an jî rêxistinekê bike, hiç kes nikare jê hesaba bixweze, an jî wê bide mehkemê, ji ber ku ew weşan ne resmî ye, organa tu rêxistinekê nîne, ne adrêsa wê heye (adrêsa di hewayê da ne, û di hewayê da jî eger yek diji, ku meriv bikaribe şikyatê xwe li ber wî bike, ew jî Xwedê ye), ne rêdaksyon heye, ji ber ku rêdaktor, nûçegihan, korêktor, fotograf, biryardar, serok her yek mirov e.

Kêmanîyêke din: kî pirtûka xwe çap bike, ew dibe nivîskar. Û biryara ku ew nivîskar e, carna ew bi xwe dide. Lê çî nivîsiyê, ne girîng e. Gelek caran jî xênji wî, tu kes wî nivîskar nahesibîne. Li hinek welatên pêşketî, wek Sovyeta berê, niha

jî li Rûsiyayê, berî ku pirtûka yekî çap bibe, komîsyona ji merivên zaneyên karê nivîskariyê, berhemên wî dixûne. Eger berhem baş bin, biryara çapkirina pirtûkê tê dayînê, pirtûk çap dibe û xwediyê pirtûkê dibe nivîskar, an jî ji bo wî rê vedibe, ku bibe nivîskar. Lê eger berhem ne hêjayî çapkirinê bin, biryara çapnekirinê tê dayîn, pirtûk çap nabe û xwediyê berhemên jî nabe nivîskar. Eger me di rûpelên rojnameya "Rya teze" da helbesteke yekî wisa çap dikir, ku teze destbi nivîsandina helbestan kiribû, me navê wî ne wek "helbestan filankes" dinivîsand, lê "edebiyethiz filankes" dinivîsand û eger ewî bi helbestên xwe va îzbat bikira, ku ew îdî helbestvan e, wî çaxî me ew nav lê dikir. Li bal me hinek kes hebûn, ku bi çewala helbest nivîsbûn, lê ne bûne helbestvan, ji ber ku kontrol hebû. Gelo ew kesê ku pêdagogî ne xwendibe, çawa dikare bibe mamostayê zimanê edebiyeta kurdî? Baş e, ku kesê bizişkî ne xwendiyê, emelyeta nake, an na wê qira mîlet bihata. Ez îdî derheqa wê yekê da nabêjim, ku eger yekî xwendibe, keftîya (garantî) wê yekê tune, ku ew merivekî xwendî ye.

Carna weşanên kurdî fikra yekî çap dikin û dû ra jî fikra yekî din di eynî pîrsê da çap dikin, ku eksi wê fikirê ye. Ev yek tiştêki normal û karekî delal e, eger fikirên herdu alîyan jî hêjayî minaqeşeyê ne. Lê eger fikra gotara pêşin an şerletanî

ye, an buxdan e, an jî nivîseke bi şaşîtiyan va dagirtî ye, ew gotara gerekê neyê çapkirinê û eger tê çapkirinê jî, hewcedariya bersivdayîna wê tune ye. Ji bo nimûnê: di hinek nivîsan da min xwendiyê, ku "...endamên HADEPê baqên gulên danîne li ber heykelê Atatirk", an jî filankesî gotiye, ku "ala tirkan ala kurdan e jî". Ez bi xwe hewcedariya bersivdayîna van kesên nabinim, ji ber ku xeta wan û ya kurdan jî hev cuda ne. Hela di ser da jî, "camêran" bi van kirin û gotinên xwe va eşkere ji me ra dibêjin, ku xeta me ya dewleta tirkan e, kî me nas nake, fermo bira nas bike. An jî, di nivîsekê da tê gotin, ku "Şivan Perwer gerekê uzra xwe ji apoçiyên bixweze". Gelo hewcedariya çapkirina van gotinan heye? Her kurdekî dilsoz zane, ku sitiraneke Şivan Perwer hêjayî hemû kar û bar û qirte-virtên apoçiyên e. An jî, min li cîkî xwend, ku "Kujerê milyonerê alman Rudolph Moshammer ê bi navê Hêriş Eli Ebdile eşkere kir, ku ew kurd e". Ya pêşin: eger ew kujer tirk bûya, meyê di çapemenîyan da bixwenda "Kujerê filankesê hemwelatiyê Tirkîyê ye", eger ereb bûya, wê binivîsandana "Kujerê filankesê Îraqî an jî Misirî ye" û h.w.d. Ya duda: di nav her miletekî da merivên nexweş û dîn hene, di nav kurdan da jî hene. Îcar emê çima vê yekê propoganda bikin? Tirkan milyonûnîv ermenî kuştin, heta niha jî li xwe mukur nayên, serseriyekî me yekî kuştîye, em vê bûyerê li cihanê belav dikin. An jî, di hin nivîsan da tê gotin ku "Yekî êzdî keça xwe ji bo namûsê kuşt", "Tosinê Reşid bi esilê xwe va kurdekî êzdî ye" û h.w.d. Ma we qe li cîkî xwendiyê, ku "Mehmed Uzun kurdekî sunî ye", an jî "Îbrahîm Aksoy kurdekî elewî ye"?

Ez fêhm dikim, ku ev kêmaniyên biçûk jî ku tên. Sebebê pêşin ew e, ku rojnamegeriya kurdî bi xurtî van 20-30 salên dawî xwe girt û bi pêş ket. Û ew pêşketin beramberî pêşketina sed salan e. Sebebê duda jî ew e, ku kesên bi rojnamegeriyê va giro karê xwe ne bi profesyonelî dikin, angê ew karê wan yê yekemîn û sereke nîne. Ango, ew kovar û rojname wek rojname "Rya teze" nin in, ku resmî be, ji navê dewletê derkeve, her roj 12-14 xebatkarên wê yên bi xwendina bilind bêne ser kar û 8 seheta bixebitin, hefteyekê da 2 hejmarên bi profesyonelîzmê va tije derxin.

Ez hîvdar im, ku ew roj ne dîr e, ku kurd wê karê weşangeriyê û çapemeniyê bi profesyonelî bikin.

STAR

GASTRONOMIE HANDEL

Tevi 300 celeb male xwe di xizmeta we deye!

- DÖNER PRODUKTION
- LEBENSMITTEL
- VERPACKUNG
- GETRÄNKE
- GERÄTE

- HÄHNCHEN DÖNER
- PUTE DÖNER
- MIX (DÖNER PUTEN)
- KALB (DÖNER)

- Penir ● Thunfisch ● Champignons ● Schinken
- Salami ● Paprika Streifen ● geschälte Tomaten
- Pizza Sauce ● Peperoni ● Pizza Box ● Pommes
- Alufolie ● Essig ● Salz

ABHOLMARKTPREIS
Öffnungszeiten: 08:30 - 18:00 Uhr

Pizza Käse-Gouda (%48):	3,09	
Thunfisch-Dose(2,65 gr.) LA PERLA:	4,49	
Puma Feta Rot (20kg.- Netto 16 kg.):	39,99	
Essig (10lt.-%5):	4,99	
Salz (10kg.-Eimer):	5,50	
Mayo Hamker-(10kg-Eimer):	11,99	
Ketchup Hamker- (10kg.-Eimer):	11,49	
Pommes (10 kg. Karton-4x 2,5 kg.):	6,99	
Schinken (kg. Preis):	1,89	
Putenschinken (kg. Preis):	4,49	
Salami (kg. Preis):	4,19	

	Stück
Pizza Box: 20x20x3:	0,071
Pizza Box: 24x24x3:	0,083
Pizza Box: 28x28x3:	0,10
Pizza Box: 26x26x4,5:	0,10
Pizza Box: 28x28x4,5:	0,111
Hamburger Box:	0,03
Menüteller:	0,10
Alufolie (1500x30 cm):	4,75

Not: Yen ku male xwe bi xwe biven di %7 erzani heye!

- FIRMA STAR KALITE YE!
- FIRMA STAR ERZANIYE!
- FIRMA STAR QASI TELEFONEKE NEZI WE YE!

Adresse: Windelsbleicher Str. 180
33659 Bielefeld
Tel.: 0521/ 5227366-77
Fax: 0521/ 5227388
Mobil: 01797805900

Cejna Sersalê „Çarşemba Sor,”

Sala Teze li cem Êzîdiyên Îraqê, Tûrkiyê, Sûriyê û wisa jî li cem Êzîdiyên Ermenîstanê û Gurcistanê

Dr. Xelîl Cindî Raşo û
Xanna Omerxalî

Di vê gutariyê da emê hewl bidin ji bo xwendevanên hêja behsa dû corên Sersala Êzîdiya bikin: yek li cem Êzîdiyên Îraqê, Tûrkiyê, Sûriyê, dû: li cem Êzîdiyên Ermenîstan u Gurcistanê.

Yek ji cejnên here mezin û girîng, ku nişana hatina demê teze ye, cejna Serê Salê ye. Cem Êzîdiyên Ermenîstan û Gurcistanê cejna Serê Salê li meha Adarê derbaz dikin, ne li meha çara - Nîsanê - çawa li cem Êzîdiyên Kurdîstana Îraqê, Tûrkiyê û Suriyê da, Çarşema Sor derbaz dikin.

Cejna Ser Salê bi gelek navên din jî tê naskirin, wek: cejna „Tawîsî Melek“ û „Melke Zeyîn“ u „Çarşema Sor“ û Kloça Serê Salê. Wek hatî xoya kirin Êzîdiyên Îraqê, Tûrkiyê û Suriyê hersal li Çarşema yekê ji meha nîsanê (li gor salnama rojê, ku bi 13 roja şundaye li gel salnama bûna Îsa) pîroz dikin. Wek ji navê wê xoya dibe, ew pîroz kirina sala nû û tazeye. Ev cejin paşvemaya ewê cejna kevin û dêrîne ku li demê Somerî û Babilîya jî pêşwaziya sala nû dikirin û digotinê „Bêt Ekîto“, anku bi zîmanê Babilî Serê salê û li wê meha nîsanê li cem wan zewaca Xudawendê wan „Temuz“, bû. Nîsan, wek hindêk vekoler û zimannas dibêjin, ji „nûsal“, hatiye, anku destpêka sala nû. Bêguman ew cejna here mezin u bi rewşa Êzîdiyane. Evê cejnê gelek taybetmendiyên xwe hene, em di karîniyê wek serrêza destnîşan bikin:

Çê nabe mirovê Êzîdî di meha nîsanê da daweta bike u jina veguhêze, ank jin anîn di vê mehê da qedexeye. Her wisa çê nabe di vê mehê da mirovê Êzîdî Ûerdê bikole! Êzîdî dibêjin: nîsan buka salêye, ew ji hemû mehên di ciwantire u mehekê di ser xwera nabîne, ji ber wê yekê jî çê nabe kes di meha nîsanê da bizewice!

Kabanîyên mala berî çend meha hêka kom dikin serhev u roja êvara cejnê ewan hêka di kelînin û bi dermanka (sor, zer, kesik, ...) rengin dikin.

Rojekê berî meha nîsanê, her malek diçe aqarî û hinek axê di îne û giyayê jêra dibêjin „Kari“, û bi qalçikên hêka deriyên malên xwe di razînin (dineqşînin), li wê baweriyê ew pêşwaziya sala nû dikin, Tawîsî Melek di vê rojê da tê xwar û dergêhê xêr û bereketê bo hemû dinyayê vedike.

Her kesek ji zaroka, qîz û xorta, meza leyiztoka „hêkanê“ dikin û ewan li hev dixînin, ka hêka kê dişkê, ew hêka xwe di dorîne.

Berê sibê gundî derdikevin dervey gund u xunava li ser giyaya kombûyî, bi destên xwe lê dixînin û ser û çavên xwe pê paqijî dikin, li wê baweriyêne.



ew xunava ewî Milyaketîye û ewê pê genc bibin!

Li roja cejnê jî cotyarê Êzîdî diçe nav çandîyê xwe û hêkên şikandî nav da belav dikin, wekî xêr u bereket bikeve nav derametê wî û berhemê salê zêde bibe.

Hemu gundî diçine ber zîyareta gund u şûnda li malê yek u du digerin, cejna Sersalê pîroz dikin. Kabanîyên mala hêk û mastî bi ser malên din da belav dikin, li wê baweriyê da xêr û bereket bikeve şîr û mastê wan û pez û çêlek û heywanê wan sax û silamet bimînin û berê wan zêde be.

Bêguman di vê cejnê da her malek li gorî şiyana xwe pezekê yan heywanekê dike qurbanî û di vê cejnê da her malek jî Sewika di pêjin u xwarinên teybet dirust dikin û diçine ser gorêt mirîyên xwe û bi navên wan ewê xêrê dixun û belav dikin.

Roja duduyê ji meha nîsanê Tiwaf li gundên Êzîdiya dest pê dikin, heta dewîya meha hezîranê (June). Yekem Tiwaf jî li bacarokê Bahzanê dest pê dike. Şûnda li rojên îni û çarşembû û rojîyên din li gundên dinên Êzîdiyan berdewam dibin, helbet her Tiwafek bi navê Xas û Babçakê wî gundî Êzîdiyane. Di wan Tiwafa da dîsan qurbanî tînen pêşkêş kirinê û kêf û şayî tîne kirinê. Xelq tev da diçine zîyaretbûna Qubên wan Xasa. Zana û dîndarên Êzîdiya

jî li ber wan zîyareta qewl û beyt û du'a dibêjin û hinek cara jî qewal def û şibaba lê dixînin. Micêwirê wan zîyareta, di wan roja da xwarineke teybet, ku dibêjinê „Simat“, bo Tiwafîkera çê dikin. Êzîdiyên Ermenîstanê û Gurcistanê (niha jî li Rûssiye) bi vê cejnê dibêjin Kloça Serê Salê. Ev cejn dikeve çarşema ewil meha sisîya - Adarê - bi rojnîşa (salmana) rojhilatî, ku sêzdeh roj şûnda rojnîşa Girêgorîyanî tê.

Hemu Êzîdî vê cejnê bi kêf û şayî derbaz dikin û dibêjin: „Bira ev roja derê xema dade, derê xêr û xweşîya veke. Ev rojeke bijareye û xemleke Êzîdiyatîye“. Her mala da Kuloç tê petîne, kîjanê ra dibêjin „Kuloça Serê Salê“, û bi vî navî cejn jî tê nas kirinê. Morîkekê di êxinin nav hevîrê vê Kuloçê (niha jî zef cara morî tê guhartin bi dirafekî biçûk). Hevîrê Kuloçê jî tê çêkirinê ji heft tiştan, wek ar, hêk, rûn, şekir, xoy, htd. Îzna qet-qet kirina Kuloçê tenê cem malxwe malê ye. Sibê zû bav yan jî kalê malê (mezinê malê) Kuloç li ser piştî zaroka kurîne biçûk vê malê datîne û ker dike. Bawerîya Êzîdiya heye, ku ew adet sehet û qewatê bide zara kurîni. Ew pêşiyê li ser Kuloçê pê kêrê rêçê dikîşîne, kîjanêra dibêjin „xeta cot“ û paşê qet-qetî dike bi du para. Paşê li ser nîvekê vê Kuloçê nav datîne ser para: malxîyê malê, para neferê malêyî mîranî, li ser beşekî din jî nava Xas u Babçakên

(Mêr û Milyaketên) Êzîdiyatî di-nivîse, para bi navê Memê Şivan - Xudanê heywanê kelî hûr (pez) û Gavanê Zerzan - Xudanê heywanê kelî mezin (dewar), para Xatuna Ferxa - Xudanê jina û jinê ya du halî (hemle) û zaroka, para Xudanê Malê, para Pîra Fat, para Şems htd. Zarok u hemû meriyên malê bê sebir hîviyê ne, ku kengê para xwe bistînin û li morîyê bi gerin. Bawerîya Êzîdiya heye, ku ev Morî para kê bikeve, ev merî gelek bextewar di vê salê da be, lê wekî morî bikeve para Xas û Babçakê, li wê wextê texmîm dikin, ku ev Xas alîkariya vê malê bike u piştevanê wan be.

Li cem Êzîdiyên Îraqê bo Kuloça Serê salê dibêjinê (Xewlêr) û li cejînda Bêlînda, meha kanûna yekê di êt çêkirin. Roja Kuloça Serê Salê, kengê Kuloç di pejandin, Êzîdî berê gunda da, akincî gurîk (agirek) vedixistin, û zarok dora gurîkê di revîyan, û hemû xelq ser gurîkê ra banzdidan û şa dibûn. Ew adetek zor qedîm û pîrzeman e, ku bi xwe nişanê temîzbûn ji hemû xirabî u nexweşî ye. Ev Guriya Agir, dîsan li cem Êzîdiyên Îraqê li cejîna Bêlînda meha kanûna yekê tê vêxistin u dibêjinê (Gurga Ga) anku Guriya agirê Gay, ji bona xatira cotiyar u gayê cot u dawî hatina çandîniyê li wê mehê di hat kirin.

Hinek Êzîdiyên Ermenîstanê bawer dikin, ku hergê pejandina

Kuloç carek bi sebebekî nehate serî, (bi vî cureyî adetek hate vebirin), çêtire, wekî ev mala îda Kuloç napete. Wekî na, çawa ewan şiro vedikin, bextê wê malê tê birinê. Lê gelek Êzîdiyên Ermenîstanê û Gurcistanê bi vî adetî bawer nakin u guhdariya wê yekê nekirî vê adetê pêşda dibirin. Her malekê da di vê cejnê da hêk tînen kelandinê û reng kirinê û çawa ku qayde, bi rengê sor û qîçîk (zer) reng dikin, kîjanêra cimêt dibêje „hêka sor“. Ew rengana - reneyê yê Rojê ne. Biçûk u wisa jî mezin berî xwarina hêka wan bi hev dixînin û hev dişikînin, u diyarî hev dikin, wisa jî didine cînar û mirovên xwe. Ew adet çawa cem Êzîdiyên Ermenîstanê û Gurcistanê heye, wisa jî cem Êzîdiyên Kurdîstana Îraqê, Tûrkiya û Surya jî heye wextê cejna Çarşema Sor (yan Serê Salê) meha Nîsanê da.

Cejna taybeta Serê Salê nişanê tezekirina jîyanêye, nişana wextê teze û tiştê nûye. Ew dema destpêkirina her tiştaye, tezekirinêye, tebe't vedibe. Pîranîya rîsm u adetêd ku tîne kifşîkirinê vê cejnê da dewlemendin bi fikrên teze efrandîna u saxbûyîna temamiya tiştê ku wextê efrandîna dinyayê da hatiye çêkirinê.

Hevpeyvînek li gel Keça Kurd

Xwezî her Kurdekî xwe nivîskar nedîta!



Hevpeyvîn: Mahîr BERWARÎ

Peyama Kurd: Te bavê xwe hînî xwendina zimanê kurdî kiriye, eva ha çawa ye û kê tu hîn kirî?

Keça Kurd: Kurxalê min Derwêşê Mele Silêman, eger ez ne şaş bim li zivistana sala 1956 ê ye hîn li dema CIVATA XORTÊN DIMUQRAT, ez li qamişlo li mala xalê xwe bûm, Derwêş waneyên kurdî didane çend xortan, ji wan Evdîrehmanê şernexî, Evdîleyê birayê wî û Mihemed, yê ku Bavê Hejar jê re digotin... Bi dersan re jî çiroka Mem û Zîn ji wan re digot. Vêce ji mereqa çiroka Mem û Zînê min ji Derwêş xwest ku ez fêr bibim. Û ez di demeke gelek kurt de fêr bûm û min dest bi xwendinê kir.

Xwendina te a dibistanê çi ye, ta kîj qunaxê te xwendiyê?

Ez bi mezinahî çûme dibistanê. Em li gundê Abirê bûn û ta sala 1960î ji dibistan li wir nebû. Piçûkên gundî û birayê min jî bi wan re diçûne gundê Tokil dixwendin, Di gel ku bavê min gelek dixwest ku ez bixwênim, lê ji ber ku ez keç bûm û tu keçên di ne diçûne Tokil, bavê min ez rê nekirim.

Bi bizava bavê min û hevalên wî li havîna 1960ê jorek ji xwendinê re ava kirin û me dest bi xwendinê kir. Rûniştêkên me teneke bûn, heryek ji me tenekek ji malê anî bû li ser rûdinişt. Mamostayek ji gundê Tilşîrê ku navê wî Newar bû an jî Nayif bû anîne gund û serê zarokê tenekeyek nizanîm du teneke genim li havîne danê û ew kirin mamosta. Paşê li dawiya salê ji dewletê re gotin û bi vî rengî dibistana gundê abirê li rex dewletê jî cihê xwe girt...

Vêce min ji polê çaran dest bi xwendinê kir. Ji polê 7an ta 12dehan min li Qamişlo xwend.

Paş ku min Bekeloriya zanistî li Qamişlo bi dest xist, ez çûme Kurdistanê başûr, li zanîngeha Silêmaniyê, li beşê ziman û edeba kurdî min xwend. Ev li sala 1971 bû. Mixabin bi hoya agirê şerî, ku careke di li navbera Şûreşa kurdî û dewleta Iraqê pêket, li roja 11 Adarê sala 1974ê em neçar bûn ji Silêmaniyê derkevin. Em çûne bajarê Qeledizê û me xwe amade dikir ku li wir em xwendina xwe bikin, lê bi wê hovîtiya Sedamî Bajar bumbebaran kirin û çend hevalên min, yên ku bi min re dixwendin şehîd bûn.; ew hevî jî di nav babîlisoka şerî de noqar bû. Vêce li meha 11ê ji sala 1974ê ez neçar bûm sinorê Iraq û Tirkîyê bibirim û paşê jî Sinorê Tirkî û Sûriyê di nav bimbana re ez derbasî Binxetê bûm û xwendina min niverê ma; sala sisîyê ji xwendinê ta 11ê avdarê min xwend û li wir jî bê dawî ma.

Hizra nivîsinê çawan li cem te dest pê kir û ewên arîkariya te kirin kîne?

Paş ku ez vegehihame Qamişlo min li dawiya 1975ê mîr kir, zarok çêbûn û min mamostayî jî dikir (seretayî) dema min gelek teng bû, demekê ez ji xwendinê dûrketim. Lê mala min ji koçika hemî partiyan bû, Mihemed weke yek ji kesên pêşî ku di partiye de kar kiriye û ew yek ji çaran ji damezrênerê Civata xortan bûye û di tevgera kurdî de yek ji yên pêşî bûye, ez jî, ji ber ku keça pêşî bûme ku ji wî parçê Kurdistanê li zanîngehê min ziman û edeba kurdî xwendî bû; millet bi rêz li me dinêrî. Ev ji rexekî û ji rexekî di penaberên ku ji parçên di yên Kurdistanê hati bûne Qamişloyê, ew jî dihatin mala me; angu em tim di nava pîrsê û dan û standinê de bûn.

Li destpêka sala 1984ê û paş

ku çend mehan min ders jî dan ez û Mihemed em her du ji kar derêxistim; bi hoya ku em li ser dewletê xeter in. Vêce ku ez li mal mam, min berê xwe da xwendin û nivîsandinê. Cara pêşî nivîsandinê min li kovara Gelawêj derketin û ez yek ji komîta kovarê bûm. Paşê jî û cara pêşî gotarên min di kovara PÊŞENG, ya ku hevalên Partiya Gel derêdixistin, belav bûn.

Kesên ku Arîkarî bi min re kirin, bêguman Mihemedê Mele Ehmed (malxuyê min) û birayê min Berzo bûn; Berzo ji zarokî ve dest bi xwendin û nivîsina bi zimanê kurdî kiri bû û li wê demê wî li gel Mecîdê Haco kovara Gelawêj der dixist. Lê ez tim dibêjim ku bavê min Emerê Evdîle Çira herî geş di riya min de pêxist û deriyên serbestiya min li ser piştê ji min re vekirin. Eger şevê min çend helbest bi stranî ji bavê xwe re negota wî xew nedikir û tim jî diwanek ji yên Cegerxwîn di bin balgeha bavê min de bû; sipîdê zû û bi dengê bilind wî helbest dixwendin; angu ez di dergûşa welatperwerî de mezin bûme û ji hejêkirina welat û gelê xwe min berê xwe da Kurdistanê başûr û min Kolîca ziman û edeba kurdî xwend û ji êşa gelê xwe min hevîrê helbestên xwe distrha.

Tu di xema çi de yî?

Ez di xema wê de me, ku me li vî welatî nekariye yekîtiyeke nivîskaran pêk binin! Eger me bikariya yekîtiyeke nivîskaran, yekîtiyeke bê berjewendiyên kesî û dîr ji ezêtiyê pêk binin, me dikarî di riya wê re xizmeteke heja ji ziman û wêjeya

kurdî re bikin. Lê sed mixabin, her yek ji me bîr li xwe dike, ji berî ku bîr li berjewendiya gelê xwe bike.

Wa bizanim, we yekîtiyek heye, an ji we hebû, erê ew yekîti çî pê hat?

Belê, raste! Di roja 24. 11.2001ê de, me yekîtiya nivîskaranê kurdîstana rojavayî damezrand û ez jî yek ji komîta berpirsiyar bûm. Û paş kongirê damezrandinê me civînek kir û di wê civînê de me komîteke ji bo derxistina kovara PÊLê pêk anî; hejmara yekê me derêxist û paş salekê me civînek ya ji bo kovara PÊLê kir; ji heft kesên ku di komîtê de bûn, çar bitenê amade bûn û paş demeke dirêj ku hejmara didoyê ji PÊLê derket, yekîtiya me bi carekê hilweşa; ne yekîti û ne ji kovara PÊL neman.

Çi di maye di dil xwe de rêj key?

Xwezîka her kurdekî xwe nivîskar nedîta! Gelek mirov wa dizanin ku bi hesanî dikarin bibin nivîskar; ji ber ku mirovekê dizane bi kurdî biaxive û xwe fêrî nivîsina tîpên latînî jî kiriye, vêce wê çima nebe torevan!? Bi vî rêbazê me gelekî ziman û toreya xwe arzan kiriye.

Hêvî ji komîtên her kovar û rojnameyêke kurdî dikim ku rêzimana zimanê kurdî serguhê xwe re navêjin; bila mirovekî zimanzan di komîta berpirsiyar de hebe û bi hûrbîni zimanê nivîsan serast bike.

Keça Kurd kiye?

Ez ji bajarê Qamişlo me û ji sala 1996ê ve li Elemaniyayê û li bajarê Dortmundê dimînim. Ez miroveke gundî me, min ta polê 6 ê seretayî jî li gundan xwendiyê; zarokiya min li gundê Girkêxelo, Abirê û hinên di bûye. Bavê min, paş ku li sala 1955ê dev ji cotkarî berda, li gelek gundan pembû diçand, vêce her salekê em li gundekî diman; li herêma Aliyan. Di vî demê de, bizaveke xurt ya tevgera kurdî li wî parçê Kurdistanê hebû û bavê min yek ji berpirsiyarê Partî dimokratî kurdîstan bû, li herêma Aliyan û ji berî partiye jî di CIVATA XORTÊN DIMUQRAT ÊN KURD e de jî dixebitî.

Zarokiya min gelekî xweş bû, bavê min gelek ji min hez dikir; ji hemî zaroyên xwe bihtir, nemaze, li dema 10-12 salî ku ez hînî xwendina zimanê kurdî bûm û min ji gundîyan re helbestên Cegerxwîn dixwendin, çeng nebûn ku bavê min pê bifire; hejêkirina wî bihtir û bihtir çêbû û wî ez bi regekî gelek berferê serbest kirim û tim jî ez di civata mêran de dirûniştim û degel diaxivim; mala me weke dibistanekê bû, bi wê zarokiya xwe min çend kes li gundê Abirê ji mîr û jinên hînî xwendina zimanê kurdî kirin. Li destpêkê min bavê xwe hîn kir û paşê min û wî bi hev re dost û hevalên partiye hîn dikirin, ji wan kesan yên ku li bîra min tên: Kirho, Ilêwiyê Silo û kebaniya wî Helîma Cemîl, Salihê Qehweçî û hinên di.



Damezrêner û serokê PDK-T hiqûqzan FAÏK BÛCAK

Ceto Omerî

Welatparêz, dilsoz, serok û rêberê, û şehîdekî nemirê hiqûqzan Faik Bûcak.

Piştî serhildana Agîrî li Kûrdîstana bakur, yê ku partiyekî jibo xelasiya gellê Kurd avakir şehîdê nemir Faik Bûcak bû. Dema ku siyasetmedar û rewşenbîrên Kurdan bi çepê Tirkan re kar û xebatan dikirin û rêxistinbûna Kurdan bi kevneperestiyê tawanbar dikirin, Faik Bûcak dest bi xebata avakirina partiyek Kurdî kiribû. Lê belê gava ku Faik Bûcak alîkarî ji siyasetmedar û rewşenbîrên Kurdan dixwaze, civakparêzên (çep ên) Kurdan, birêxistinbûna Kurdan ji bilî çepê Tirkan rast nabînin û alîkariya wî nakin. Faik Bûcak gava ku nikare alîkarî ji rewşenbîrên Kurdan bistine hêrs dibe û destê xwe li masê dixê û piştê ji rewşenbîran re weha dibêje "ger bi alîkariya we nebe, ezê bi barkêşan (hamal) be dîsan Partiyekê Kurdî damezrinim". Belê Faik Bûcak partiya xwe ne bi barkêşan re be jî dîsa damezirand û di dawîya 1965'ande li Kûrdîstana bakur yekemîn Partiya Kurdî bi navê Partiya Demokrata Kûrdîstanê Ya Tirkîyê PDK-T damezrand. Piştî avakirina partiya xwe bi çend mehan di 4.ê Tirmeha 1966'de ji aliyê hêzên tarî ve hat şehîd kirin. Bila axa wî pir û gora wî bihuşt be. Îroj li Kûrdîstana bakur ji zarokên 10 salî bigrin heta kesên 70 salî navê Deniz Gezmiş û hevalên wî dizanin. Lê tu kesên ku temenê wan ji 40-50 salî kêmtir e navê Faik Bûcak bipirse yên ku dizanin wê dê pir kêmbin. Eva han eybeke mezine jibo me. Diwiyabû ku Faik Bûcak û hemû welatparêzên ku di avakirina PDK-T'de cih girtine ji Deniz Gezmiş û hevalên wî zêdetir bihatana naskirin. Ew jî pêşî kêmasiya PDK-Bakur e. Piştê partî û kesên din-ku ji kevneşopên PDK-T hatine, û piştê jî kêmasiya Serhat û Sertac Bûcak e, ku baş xwedî li dîroka xwe derneketine. Diwîya bû ku Faik Bûcak bi Pirtûkan, bi biranînên salane bi rozetan bi afîşan û bi malperêk taybetî bihata danasîn.

Dîrok ronahiye, rastîye, tu kes û hêz nikare dîrokê li gor dilê xwe bicebirine, min biranîna gellek navdarên Kurdan xwendîye lê belê di biranînan de hertim jî ew bîna sensûrê dilê min xelandîye. Bi taybetî jî civakparêzan di dîroka PDK-T û Faik Bûcak de bêbextiyê dikin. Heta ku mirov dîroka TIP,DISK û hwd. binivîsîne dikarin behsa PDK-T bikin, ez nabêjim ku bila dîroka TIP,DISK,TIS û hwd. nenivîsinin bila binivîsinin lê her çikas Kurdan di nava van partî û sendîkayên Tirkan de xebat kiribin jî, di dawîyê de ew partî, sendîka û dîroka Tirka ye. Ji bo dîroka pêvajoya demokrasîya Tirkan pêwîste ku TIP,DISK bêne

nivisandin. Lê jibo Kurdan dîroka Kurdan girîngtîre, Deniz Gezmiş şoregereki çikas mezin be jî, jibo min Faik Bûcak, Saîd Elçî û hemû şehîdên Kurdan jî şoreşgerê xelkê girîngtîrin. Min gellek civakparêz dîtine ku di mala wan de wêneyê (sûret) Lenin, Ernesto CheG., Karl Markis hina jî hene, lê bila cihan bizanibe ku tu kes û şoreşgerên xelkê nîkare wek û herfa pêşî ya Mella Mistefa Barzani bi giranbihayek taybetî di dilê me de cih bigre.

Gava civakparêzên me di salên 70'de bi Lenin, Markis, Stalin, Mao û Enverê Albanî re serbilind dibûn û ji bona van hevdû dikuştin û Barzanîyê nemir jî bi sîxurbûnê û bi xûlamtîya imperyalîzmê tawanbar dikirin, berî van bi deh salan Faik Bûcak tîkîlî bi Barzanîyê nemir re danîbû. Hina di wê demê de tîkîlîya PDK-T û PDKI gelek xurt bûye.

Gava gelek behsa internasyonalîzmê dikirin Faik Bûcakê nemir jî bi Kurdîya xweyî zelal liser welatparêziyê û li ser Kûrdîstana şêrîn helbest dinivîsand. Ew bi dîtînen xweyên raserîn ya pêşerojê di helbestên xwede xuya dike. Ji xwe dijminê gelê Kurd jî ew rastîya Faik Bûcak dîtîbûn ku bi hêzên xwe yê tarî wîna şehîd kirin. Bêguman şehîdkirina Faik Bûcak derbeke mezin li şoreşa Kûrdîstana bakur xist. Ger Faik Bûcak nehatiba kûştin îroj komara Tirkîyê wê nikaribûya weledê xaniman li serê me bikira serok. Ev nivîsa min jî bona biranîna şehîdê nemir Faik Bûcak e. Li vira bangêkî ji PDK-Bakur û partiyên ku ji kevneşopên PDK-T hatine dikim, ku dikaribin ji kerema xwe re malperêk internetê bi taybetî jibo şehîdên xwe çêbikin.

Ez nivîsa xwe bi dû parzemîna helbestek şehîdê nemir Faik Bûcak xelas dikim.

SONDA MIRINÊ

Sonda me mirin e di rîya te da welat

Kefen û kirasên me ne, ferman û xeml û xebat Xeynî mirinê dinê de bo me nebûye xebat

Xwîyna me hat firotin pê bistînin Kûrdîstan

Em diltîyê naxwazin pir bi rûmete goristan


Kal pîr ser tirba kuştîya digrîne Dil û kezeba wan gişka tijî kul û birine

Law bûk hemû ji xwîn digrîne Xwîyna me hat firotin pê bistînin Kûrdîstan

Em diltîyê naxwazin pir bi rûmete goristan

Faik Bûcak

Li Parlemantoya Ewrûpa li ser pîrsa Kûrdên Sûriyê konferanse hat li dar xistin



Li Parlamena Ewrûpayê di konferansê de pîrsa Kurdî li Suriyê hat gotûbêj kirin. Di konferansê de, pîrsa Kurdî li Sûriyê ji aliyê siyasetmedar û rewşenbîrên ji Başûrê Rojavayê Kurdistanê ve bi gelek awayan hat diyar kirin. Konferans ji aliyê Parlamentera Partiya Gel ya Parlamena Ewrûpayê Frieda Brepoels û Enstîtuya Kurdî ya Brukselê ve hate organîzekirin.

Li ser navê Enstîtuya Kurdî ya Brukselê, Derwêş Ferho ji rojnameya me re ragihand ku wan bi armanca balkişandina ser pîrsa Kurdî li Sûriyê ev konferans amade kirine û wan ji Parlamena Ewrûpayê daxwaz kiriye ku ew di derbarê vê pîrsê de hişyartir û çalaktir be.

Di konferansê de hat ziman ku pîrsa Kurdan li Sûriyê, ne pîrsa berdana gir-

tiyan û peydakirina nasnameyan e; pîrsa Kurdan pîrseke netewî ye.

Dr. Kamiran Bêkes (Berpîrsyarê rêxistina Ewropayê ya Partiya Yekîtiya Demokrata Kurd li Suriyê), li ser rewşa Kurdan ya piştî Serhildana 12ê Adarê rawestîya û bal kişand ser serbestberdana girtîyan.

Dr. Sededîn Mele (Berpîrsyarê rêxistina Ewropayê ya Partiya Yekîtiya Kurd li Suriyê), di konferansê de li ser mafê çarentûsî yê gelê Kurd axivî. Têkiliyên Partiya Bees li gel Kurdan ji aliyê Dr. Abdilbasit Seyda ve, helwesta Yekîtiya Ewrûpa ya li hemberî Kûrdên Rojhilat ji aliyê siyasetvan Beşar el-Îssa ve, mafê kêmtewan ji aliyê nûnerê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYDê rêxistina Ewropayê Abdulmecîd Melek ve hat şîrove kirin.

Amerîka rapora xwe ya mafên mirovan ragihand

Birêvebiriya Amerîka, di pîrsa bînpêkirina mafên mirovan de Tirkîyê, Îran û Sûriyê dane ber tîrên rexneyan

PK-Navenda Nûçeyan

Li gora rapora Amerîka li Tirkîyê, di warê demokratîkbûnê de pîrsgerêkên mezin hene, Sûriyê Kurdan diçewisîne û li Îranê jî pîraniya mafên mirovan tene bînpêkirin.

Rapor ji aliyê Wezaretê Karûbarê Derve ya Amerîkayê ve hat amade kirin û ew ji aliyê Wezîra Karê Derve Condoleezza Rice ve hat ragihandin. Di rapora mafên mirovan de ji bo Tirkîyê tene gotin ku hikûmeta AKPê sînoran li ber azadiya olî datîne, azadiya ramanî û xwe îfadekirinê ceze dike û li pêşîya xebat û livbaziyan partiyên siyasî dibe kelem. Her wiha hat gotin ku li gora raporê rêxistinên mafên mirovan, hina jî li Tirkîyê mirov tene îşkence kirin û muameleya xerab bi wan re tene kirin.

Di rapora Wezaretê de dadgêriya Tirkîyê jî tene rexne kirin ku ew dibin bandorê de ye û ne serbixwe ye.

Tê ragihandin ku rayedarên Amerîkî ji bo amadekirina vê raporê, tîkîlî li gel grûb û komikên siyasî, olî û çandî danîne û rewşa mafên mirovan li gel wan gotûbêj kirine. Her wiha wan hevdiin

li gel brokrat, dadmend û birêvebiran çêkirine.

Di rapora Wezaretê Karûbarê Derve ya Amerîkayê de li ser Sûriyê jî tene rawestan û tene gotin ku ew Kurdan diçewisîne. Li gora birêvebiriya Amerîka, Sûriyê sponsoriya terorîzmê dike, kêmtewana Kurd ya bê dewlet diçewisîne, zorê li rêxistinên sîvil dike û hevîyên jiyaneke siyasî ya vekirî ji holê radike. Tê gotin ku birêvebiriya Sûriyê parêzerê mafên mirovan Aktham Naissa jî girtiye.

Li gora rapora wezaretê, li Îranê jî rewşa mafên mirovan ji berê xerabtir bûye û maf bi her awayî tene bînpêkirin. Ji înfazên bi lez bigre, heta wendakirina mirovan, ji çêbûna kujerên radikâl bigre,

heta bi îşkencekirin û heqaretê, her tişt tene kirin. Tê gotin ku serokê olî Ayetullah Ali Hamaney, dadgêrî û birêvebiriya azad bernade û pîraniya artêş û polîsan jî bi xwe ve girê daye. Li ser azadiya çapemeniyê jî tiştên baş di derbarê Îranê de nayên gotin. Tê ragihandin ku çapemeniya azad tene çewisandin û xebatkarên wan tene girtin.

Jinekolog, mêrekolog, dînekolog Prof. Doc. Dr.

Fatê Were Civatê




Şêxbat

Xaltika Fatê, xortek 24 salî me, li Amedê dijim. Derdê min pir girane, tu kesî çare jê re nedît. Ez dil ketime jinekê 45 salî, ew niha li Fransa diji. Lê ew dibê ez piçûk im û em ne li gora hev in. Ez jî dibêjim bimrim ji axê re û bijim ji te re me. Lê ew guh nade min. Ez nema zanîm bê ezê çi bikim. Ew jinek pir xwedî tecrûbeye, biaqil e, merd e, hema hertişt e. Wê rojê min Mihê yê Xançepeki dît, ewi got „ eman neman xwe bavêje bextê Xaltika Fatê, çare hebe li cem wê heye!“ Îcar min jî xwe avêt bextê te û xwedê, ez çi gûyî bixwim?

Memê Teradîni / Amed

Memê Teradîni, lao ma derdê te jî derd e peppûko, tiştik-miştikê wilo li cem xaltika te Fatê ne tiştik in. Lawkê mino, tu dibêji jinik bi bîst salan ji te mezintir e, xwedî tecrûbeye, biaqile û hertişt e. Ê lao te di vir de gû xwariye haaa! Hey bêbext, ma ez ji bo çi me? Tu bêji aqil aqil, tecrûbe tecrûbe, merd merd, ma çi li cem min heye û çi tune ker kurê kerê! Ê lao, heger ew li Fransayê diji, ê min ez li dinyayê dijim. Heger ew xwedî tecrûbe be, ji xwe ez pîrka tecrûba me, heger ew merd be, ji xwe kes wek min merd tune, doxîna min ji a wî sisttir û mezintir e. Heger ew 45 salî be, ê min ez 60 salî me. Îcar Memê teradîni, yek wek Fatê li vir e lê tu aşîqî yeka din dibî! Lao ma ev aqil e hey bêaqil! Ji xwe ez jî ji xwe re li yekî 24 salî digeriyam ma ji vê fersendê çêtir fersend heye kero! De zû pasaporta xwe ji min re bişîne, ezê te binim cem xwe û nermik-nermik te bifirkînim berxê mino! Emê xwe li bin guhê hevxin, tewkeli bi xwedê, ma dinya ji bo çi ye ez qurban!



Xaltika Fatê, ez 12 salî me, min di Newroza Mêrsinê de ala Tirko şewitand û hatim girtin. Ez vê namê ji hepsê dişînim. Min hertişt fêmkir, lê min fêmkir bê çima Leylo, Beqirxan û hevalên xwe li vê ala nijadperest xwedî derdikevin? Îcar bi ser de jî dibêjin “ala Tirko ala Kurdan e jî“. De îcar yaboo!? De werin û din nebin haa! Bi xwedê min bixwe tişt fêmkir, gelo te çi fêmkir?

Evdoyê Çeqilmast / Mersin

Çeqilmastê mino, xaltî bi qurban, heçê zane zane heçê nizane baqê nîskan e berxê mino! Niha Beqirxan xwarziyê Şenkal Atasoy ê serokê Mîtê ye, Tirk e, xwedî li ala xwe derkeve ne ecêb e, heqê wî ye. Bav û kalên wî ji bo vê alê bi sedhezaran Kurd kuştine, ala xwe bi xwîna Kurdan sor kirine, xwedî li ala xwe derkevin normal e. Leylo Nezan li ala Tirko xwedî derkeve dîsa normal e. Te go çima? Ê lao rebenê deh salan li koşka Tirko raza, di hepsê de porê xwe kur kir, bû dermale, hîni Tirkî bû, ma ev belaşin qey hêê!? Ma kî di hepsê de belaş li kesî dinere berxê min! Leylokê nanê wan xwariye, ava wan vexwariye, xwe naskiriye, ma wê ji bo çi xwedî li ala wan dernekeve! Me ev hemi fêmkirin. Lê tiştê ecêbmayî çîye tu zanî? Piro Haco jî li ala Tirko xwedî derket!? Qey Tirka destê xwe di ser serê wî re jî birine bavoo! De oxira wî ji a Leglegê be, ma em çi bêjin! Lao Çeqilmasto, te wek navê xwe dinya serûbinê hev kir, bi xêra te qûna reş û spî dewket meydanê! Eman careke din ji hepsê dernekeve û tu al û malan neşewitine haaa, yan bi xwedê, hîna gellek kes di dorê de ne go bêjin “ala Tirko ala Kurdane jî!” Eman emann!!

fate@peyama-kurd.com

XÊR Û GUNEH

Berhevkar: Bavê RONAHÎ


Jinek tol (qehpik) diravên ji toletiyê vedigirtin, piştî mesrefa xwe ya xwarin û vexwarinê, libas û kirêya xênî ûwd jê derdixistin, diravên jiber diman jî, ji xwere dikirin xêr û xêrat. Ji bo mizgeftê mahfûr, sica-de, xaliçe dikirin, tamîra mizgeftê û mesrefên wê yên hûrûmûr jî liser hisabê wê bûn. Rojê jînika tol xwe bixwe diponije û dibê: “Xwedêwo, ez evqas sale toletiyê dikim, diravên jiber mesrefa min dimînin ji dikim alîkari jibê Mizgeftê. Lê ez nizanîm, gunehên min zehfîn an jî xêren min? Ez nizanîm ez biheştîme an jî do-jehî? Jinik dike nake neşê vê aloziya di serê xwe de biverêşîne. Dawîyê biryarê dide ko vê pîrsê ji Mele bipirse û jî binê vê bandor û aloziye bifilite. Jinik diçe nik Melê. Mele jiber

alîkariyên wê qedirek gelek bilind didê û jê sedema serdana wê dipirse. Jinik jî ji Mele re dibê: “Seydayê hêja tu dizani ez zehf alîkariya mizgeftê dikim. Lê ez van diravan hemûyan ji firotina goştê xwe qezenc dikim! lewre ez ninanim ka gunehên min zêdene yan ji xêrên min. Herweha ez nizanîm ez biheştî me yan jî do-jehî?” Mele hinekî diponije û bi dengê nizim û nermik ji jînîkê re dibê: “Keça min, tu ji mizgeftê re mafûr, sica-de û xaltîyan dikirî. Momin tèn li ser nimêjê dikin, duayan dixwînin. Xwedê ji te re xêrek gelek mezin dinivîse. Ji aliyê din tu goştê xwe difiroşî, ew jî zina ye, gunehê wê jî gelek mezin e. Ez bawer dikim dê xêr û gunehên te lihev derên, qûn çirandina te jî, ji tera dimîne.

Xaçerêz

SEREJÊR

1. Hebûn, sermaye, malûmilk / toreyî, şikl
2. Navekî mîran / maç, maçikirin
3. Bendkirin, astengkirin
4. Genimê kelandî (paşûpê) / heywanek / lihevhatinek navnetewî
5. Seks, hezkirina zayendî / jin didin serê xwe / bide min, kani
6. Cejna, şahîye, îde / serê sibehê, aso / nex, nexweşiyek
7. Rîh, gûkirin / helwest, nêt (paşûpê) / cendek, laş (paşûpê)
8. Reşik, zebanî, hût / bejn û bal, endam
9. Navekî mîran / incasa piçûk, fêkiyek
10. Navbera dest û mil / navekî Çînî



ÇEPERAST

1. Ne sar û ne germ, hênik
2. Dudilî, bêbiryarî / da tîpên dengdar
3. Navekî mîrên Ewropî / kurtênivîsa entya rizgariya netewî
4. Dayik (paşûpê) / ciwamêr, xwesgotin (paşûpê)
5. destnîşaniyek, gotinek ecêbmayîne
6. Zept kir, ket nav destan (paşûpê)
7. Çiyayekî Kurdistanê, Agirî / na, nexer
8. Bi zîmanê Almanî sazî / gûkir, bi xwedê kir (paşûpê) / kurtênivîsa endamên cendirmên Natoyê
9. Şans, qird, nesib (paşûpê) / hawar, gazî
10. Nerm, elastîk, xirek / nîjad, reng, qewm
11. Nexweşiyek, nex / mane, naverok / dîn, bawerî
12. Navekî xortan (paşûpê) / navekî Yûnanî

Bersivên hejmara berê

Çeperast

1. Dalme / merî
2. Endonezya
3. Saad / raife
4. Tî / eyb / ney
5. Hov / gana
6. Emad / ba / ar
7. Liret / misk
8. Ir / az / ti
9. Teknîker
10. Du / azadî
11. Ames / nan
12. Rûme / ozan

Serejêr

1. Desthelatdar
2. Anatomî / eu
3. Îda / varik / an
4. Mode / dername
5. En / yg / ize
6. Erbab / akaso
7. Mza / namzed
8. Eyîna / rîna
9. Rafe / ast / an
10. Eyarkirin



Beran (21.03-20.04)

Tu enerjîya xwe ji bo xelkê xerc dikî. Berê xwe biguherîne û piştîre alîkariya kesên din bike.



Mêzên (23.09-22.10)

Tu îro ji xwe acizî, westiyayî. Giraniya xwe bide tiştên ku kêfa te bîne. Dev ji fikaran berde.



Gamêş (21.04-20.05)

Bi nedostan re negere. Têkeve nav civatekê ku kesayetiya te û wê civatê li hev bikin.



Dûpişk (23.10-21.11)

Tu di hiş û bedena xwe de kamilî û dixwazî di jiyana xwe de guhertinan çêkî. Sergiran be.



Cêwî (21.05-21.06)

Alternatîfên çareserkirina pîrsgîrêkan li pêşya te ne. Ji kesayetiya xwe re sadiq be, arif be.



Kevan (22.11-21.12)

Tu ne sersar î. Şahiyeke xuya dike, tê bextewar bî. Tu tê pesinandin û çavê gelekên li ser te ye.



Kevjal (22.06-22.07)

Dilşikestin û poşmani heye. Biserneketin ne dawîya dinyayê ye. Serpêhatî mirêka pêşerojê ne.



Kovî (22.12-19.01)

Karê te hêdî lê baş dimeşe. Her çiqasî pîrsgîrêkên te hebin jî, ewê derbasbin. Bêhnfireh be.



Şêr (23.07-22.08)

Tu xêrxwaz û alîkarê dostên xwe yî, bi wan ve dibezî. Lê hinekî bi xwe jî dakeve.



Satil (20.01-18.02)

Tu mirovekî berxwedar î, erênîyî. Tu ji tiştêkî xwe nadi paş, gavê bi şûn de navêjî. Rêwîti heye.



Simbil (23.08-22.09)

Serê xwe zêde bi pîrsgîrêkan re neêşîne. Dilê hezkiriyê/ya xwe nehêle. Rêwîti heye.



Masî (19.02-20.03)

Ji xwe hez bike da ku kesên din jî ji te hez bikin. Berê can, dûvre canan. Xwe biguherîne.

Zelal

Çiyan su e
su Zelal e



Navend:
Trink-Zel (Köln)
Tel.: 0221 376 24 05

Bayiyên Zelal

AKCAN GmbH (HAMBURG)
Tel.: 040 723 402 96

LIZA GmbH (BERLIN)
Tel.: 030 390 380 30

ESD Softdrink GmbH
(MANNHEIM)

Tel.: 0621 318 76 70

TRINK-ZEL II
(DÜSSELDORF)
Tel.: 0211 49 62 150

CAN GETRÄNKE (ESSEN)
Tel.: 0201 289 74 17-18

TRINK-SEM (DORT-

MUND)
Tel.: 0231 981 86 23

HARRAN GmbH
(FELLBACH)
Tel.: 0711 592 08 64

CHAPLIN GETRÄNKE
(BREMEN)
Tel.: 0421 691 96 78

EURO-FRESH-FOOD GbR
(ERFURT)
Tel.: 0361 26 27 516

TRINK-ZEL I (KÖLN)
Tel.: 0221 977 63 11

NERGIZ
Tel.: 02562 22 168

روژنامه گهري تهنا و تار و هه قه يقين نيه!

سارا كهريم

پتر له ههشت ژماره‌ی ههفته‌نامه‌ی په‌يامی كوردم خويندو ته‌وه و زور بابته‌ی به پيز و باشم تندا به‌دی كرده. له راستيشدا مایه‌ی شانازی و خوشحالييه كه كوردیش وهك زور له نه‌ته‌وه‌كانی ديكه. روژنامه‌ی به زمانی خوی هه‌بيت له ئه‌وروپادا و كاتيكيش په‌يامی كورد له سهراسه‌ری ئه‌روپا بلاو ده‌بيته‌وه، ئه‌وا له‌خويدا گور و تينيكی ديكه ده‌بخشیت به نووسه‌رانی كوردی كه له ولاته جياوازه‌كانی ئه‌وروپادا نيشته‌جین. ئه‌وه‌ی ليزدا ده‌مويته‌ بيليم "شكه" ره‌خنه‌یه‌ك نيه‌یه كه له په‌يامی كوردی بگرم به مه‌به‌ستی ناب‌جی "خانه‌خواسته"، به‌لكو وهك مرۆچك كه هه‌ست به به‌رپرسیاریه‌تی سهر شانی خوی ده‌كات له به‌رامه‌ر به‌ره‌و پيشه‌وه بردنی ئه‌م هه‌فته‌نامه‌ خنجیلانه‌یه، ده‌خوازم ئه‌وه‌ی كه پيوسته‌ زیتير بايه‌خی پي بدریت بۆ روژنامه، ريبورتاجه تا ده‌كات و تار و راپورته هه‌وال و ليكولنه‌وه. گرنگی ريبورتاجيش له‌وه‌دايه كه زور بابته‌ی گه‌راموگه‌رممان ده‌خاته به‌رده‌م، سهرباری ئه‌وه‌ی كه زانیاریه‌كانی راسته‌وخۆ له شوینی خويدا وهرگراون. ئه‌وه‌ی كه مایه‌ی تيرامانه ريبورتاج زور كه‌م به‌دی ده‌كریت له په‌يامدا، ئیدی نازانم هۆیه‌كه‌ی چیه‌؟ هه‌رچه‌نده ستافی په‌يامی كورد "هه‌ر يه‌ك له ئاستی خوی" ده‌توانن بابته‌ی ريبورتاجی ريك و پيك ده‌ستيشان بگهن، ئه‌م كاره‌ش به بۆچوونی خۆم هه‌فته‌نامه‌كه‌ زیتير به‌ره‌و پيشه‌وه ده‌بات و پتر له ره‌وه‌ندی كوردیان نزيك ده‌كات‌وه و هيزیكي پته‌وتريش به په‌يوه‌ندی نيوان په‌يامی كورد و ره‌وه‌ندی كورد له ئه‌وروپا ده‌به‌خشیت.

**به‌كوردی بدوی، به‌كوردی
بخوینه،
به‌كوردی بنووسه، به‌كوردی
بیربكه‌روه!**

ئارفين ئيسماعيلزاده مندالیکي ته‌مه‌ن دوازه سالانه خه‌لكی شاری بۆکانی روژه‌لاتی كوردستانه، له پۆلی شه‌شهمی سهره‌تایی ده‌خوینی له‌شاری كوین "ئه‌لمانيا" به‌شداري له زۆربه‌ی پيشه‌په‌كه‌كانی مه‌له‌وانی كرده‌وه له هه‌ریمی نۆرداين ئيستفالی ئه‌لمانيا، له‌زۆربه‌ی ئه‌وپيشه‌په‌كه‌كانه‌دا، مه‌دالیای به‌ده‌سته‌په‌تاوه. هه‌روه‌ها له پيشه‌په‌كه‌كانی نۆده‌وله‌تی بۆ مه‌له‌وانی له نه‌مسا به‌شداري كرده‌وه. په‌يامی كورد دیداریکی كورتی له‌گه‌ل ئه‌نجامدا:

**په‌يامی كورد: چۆن ده‌ستت به مه‌لكردن كورد؟
وه‌لام:** ته‌مه‌نم پینج سال بوو، روژیک مندالیکي هاوسیمان هاوته‌مه‌نی خۆم بوو باسی مه‌له‌ی بۆكردم، منیش به‌دایك‌م گوت و هه‌رئه‌و روژه منی برد بۆمه‌له‌وانگه. ورده‌روه فیربووم تانه‌مرۆ.

**په‌يامی كورد: ئه‌ورژانه كه مه‌شق ده‌كهن چهن مه‌تر ده‌بن؟
وه‌لام:** له دووسه‌د مه‌تر ده‌ست پیده‌كه‌ین تا ده‌گاته هه‌شت سه‌د مه‌تر، له‌و روژانه كه مه‌شقه‌ردنی ئاسایه، به‌لام له كاتی پشوی قوتابخانه روژانه هه‌وت تا ده‌ کیلۆمه‌تر مه‌له‌ ده‌كه‌ین تا وه‌كو توانای ماسوولكه‌كانی له‌شمان به‌هیزترین له كاتی مه‌له‌كردن.

**په‌يامی كورد: كاتیک لیت ده‌پرسن تۆ خه‌لكی كوینی تۆ ده‌لنی چی؟
وه‌لام:** ده‌لیم من كوردم

**په‌يامی كورد: ده‌توێ له دواژۆ بی به‌چی؟
وه‌لام:** مه‌له‌وانیکی به‌ناو و ده‌نگ و فرۆكه‌وانیکی باش.

**په‌يامی كورد: بۆچی؟
وه‌لام:** بوئەوی مندالانی كورد فیزی مه‌له و زمانی ئه‌لمانی بگه‌م.

**په‌يامی كورد: له كرتایی چیت مه‌یه بیلینت؟
وه‌لام:** سوپاسی دایك و باوكم ده‌كه‌م، به‌تایبه‌تی دایك كه زور هانم ده‌دات له وه‌زش و خویندن.

په‌يامی كورد ئاماده‌ی

بلاو كرده‌وه‌ی ريكلامه‌ی

**بازرگانی و بروسكه‌ی پیرۆزبایی
و پرسه‌نامه‌یه به‌نرخه‌ی گونجاو**

ئارفين ئيسماعيلزاده... سنالی مه‌له‌وان خاوه‌نی هه‌شتا مه‌دالیایه



بچوكترين كۆمپيوته‌ر له جيهاندا



كۆمپانیايه‌کی ئه‌لكترۆنی ژاپۆنی توانی بۆ يه‌كه‌م جار بچوكترين كۆمپيوته‌ر درووست بكات. ئه‌م كۆمپيوته‌ره ته‌نها له پینج پینووس پیک دیت. ئه‌م پینووسانه له رینگه‌ی نيشكه‌وه مۆنیتۆر و كيبۆرد درووست ده‌كهن، به‌جۆریك يه‌ككيان روو ده‌كریته دیوار بۆ نيشاندانی مۆنیتۆر، يه‌ككيشیان رووی ده‌كریته كه‌سی به‌كاره‌په‌ر به مه‌رجیک شتیکی ته‌ختی له پيشدا‌بیت تا ره‌سمی كيبۆرده‌كه‌ی له‌سه‌ر ده‌ریكه‌ويت، سێ پینووسه‌كه‌ی تریش رۆلی ماوس و هارد دیسك و پارچه‌كانی تر ده‌بینن، كارگه‌ران و پسپۆرانی ئه‌م كارگه‌یه كار بۆ ئه‌وه ده‌كهن كه له داها‌توودا بتوانن ئه‌م كۆمپيوته‌ره پینج پینووسه بچوك بگه‌نه‌وه بۆ ته‌نها يه‌ك پینووس.

پیرۆزبایی



له ناخی دهمانه‌وه جوانترین پیرۆزبایی له كاك وه‌لید خالید و سوواد محمهد ده‌كه‌ین به‌بۆنه‌ی چوونه ناو كه‌ژاوه‌ی هاوسه‌ری یانه‌وه، به هیوای ته‌مه‌نیکی درێژ و ژیا‌نیکی به‌خته‌وه‌ر. هه‌نكه‌وت زا‌هیر- شتوبگارت

Alan-Food GmbH

Alan-Food Döner

Kalite Erzani Servis

Culux

Mirisk Qime

SERANSERÎ AVRUPA

Belcika Tel.: 0484 606 930
Almanya Tel.: 0172 438 77 04

ئازانسى توریستی

NEW PLAN

ئیمه ئاماده‌ی خزمه‌ت كرده‌ی هاو‌لاتیانی كوردی عیراقین

كوردستان له رینگای تاران‌وه

قیزای ئیران له ماوه‌ی دوو هه‌فته‌دا

له‌گه‌ل هه‌ر بلیتیکی دووسه‌ره‌ی تاران، مه‌ودای خوارن له شیکترین رێستوران له تاران به مۆزیکي زیندوو

خه‌لات

Thomas-Mann Str, 24
53111 Bonn
Germany
Tel.: 0049 (228) 180 24 34
Fax: 0049 (228) 180 24 38
E-Mail: info@newplan-travel.de
www.newplan-travel.de

گه‌شتی توریستی
بۆ سهرتاسه‌ری جیهان
تاران له ۲۲۰ عه‌

بلیت بۆ
سهرتاسه‌ری جیهان
حه‌جی
"عمه‌"

Têgeha azadiyê û azadiya jinkê -1-

Dewleta Elî

Azadiya jinkê, gelek pirs di serê mirovî da dixululînit, wek buçî ya bindeste?, bi çi ve ya girêdaye û kê bindest kirîye? û htd... bo bersivdana van pirsên, pêdivîye em du xalê giring bideyn ber çavê xwe, xala êkê: têgeha azadiyê, ya duwê: çarçûvê azadiyê. Ev herdu xale divê ji bo jinkê û zelamî bêkve bihêne wergirtin, ji ber ku herdu bihevra hevpişkîyê di jiyana da diken.

Da pêtir di nav babetî da biçin û diyar bikeyn, ya fer ewe ku em civaka xwe ya îro binîyasîn û bizanîn ku ji verêja sê qonaxa hatîye pêkanîn:

1. Civakek cutiyarî: civakek sade, dwir ji teknoluciyê û pêşkeftinê, vekirî, pêtir azad bixwebawer û paqij.

2. qûnaxa veguhaztina jiyana ji gunda bu bajera: civakek pêtir berev pêşkeftinê ve çuye, lê tirsîyay, dûrpêçkirî û bindest.

3. Roja eyro: ku ji sadeyê û tirsê û me'romiyê çûye di nav civakeka ku e'rdî heta esmanî ji me û jiyana me dwir.

Dema em daxwaza azadiyê dikeyn, bila em xwe neînine rêza welatê ewrupayê, berê xwe nedeyne azadiya wan bi hemî layet wê ve, pêngavê bîlez û fireh

ne havêjin da bigehîne peyiska wan, ji ber ku dê westin û dê berhingarî problema bin. Azadiya wan, tiştê normal û diruste bo wan, ewe çend sale yê li ser hatîne taşandin, ewa wan bi sala wergirtî, bi zehmete em bi roja li ser xwe praktîk bikeyn, ew baş têgeha azadiya xwe û sinûrê wê dizanin û dizanin ka çawa bikarbinin, lê pa di gel me û kulturê me, na guncî, ji ber, ne em li ser hatîne taşandin, ne ji em dizanîn bikar binin, paşmayê me yê taşandinê, yê tim bi ol û kultur û civakê ve girêday, ew kesatî nedaye me ku em bişeyn xwe di çarçûvê azadiyeka hosa da biparêzin. Evca ger em kirasê vê azadiyê li ber xwe bikeyn, dê kevîne gelek tengaviya, ji ber ne kirasê meye, ne ji bi kêr me têt, me bi rêka taşandinê ne inaye, lê bi rêka wergirtinê û wergirtineka kore. Heta niha em bi duristî têgeha azadiyê nizanîn, û nizanîn ka jinka me di nav çi qeyda daye, gelo azadî çîye? Eger azadî ew bit ku dest ji hemî tiştên bihête berdan, ew ne azadiyê, belko zîndana azadiyêye, bihayê vê azadiyê gelege û ew biha hemî, ji gelek tiştên bihagiran yê ku ciwanî û nazikî û jinîniya jinkê têda, têtê dan. Ez ne diji azadiyê me û nexasime azadiya jinkê, ji ber ku êk ji giringtirin mercê pêşkeftina milleta, azadbûna jinkê ye, lê da ku azad bibin, ya fer ewe, em

bi duristî têgeha azadiyê bizanîn, xwe ji hizir û birê xwe yê paşkeftî qurtal bikeyn, xwe ji zîndana hezê xwe xilaskeyn, ewe valatiya di nefis û mejiyê xwe da, bi qenaetê û zanîne û têgehîstîne tijî bikeyn, hest bi tîrîyê bikeyn ji hemî la ve, da bi çavê bîrsî li tiştên nenêrin, baweriyeka mezin bideyne xwe da ku pêşkeftinê mezin binin. Gelo çî dibêjine daxwazkirna zelamî bo azadiya jinkê, û ew bi xwe girtîyê hez û evînet nefsa xwe ya vala ye? Çî dibêjine daxwazkirna jinkê bu azadiya xwe û ew bi xwe nizanî ka azadî çîye û sinûrê wê çî ne. Bê guman ewe ne guneha jinkê ye, ne ji ya zelamî, lê guneha taşandina malê ye, ya ku li ser taşandina olî û taşandina civakî radiwestit. Di çarçûvê wan herduwa da, gelek tişt bi şermeka mezin û gunehaka bê şefaet û tirseka bê sinûr bo me hatîne berçav kirin, lewra ji gelek mirad û merem mayne di nefsa me da, bo zanîn û tîrkirna vê nefse, gelek hene di êkemin delîva azadiyê da, xelet di azadiyê digehin û dikevîne tepka wê. Li milletê wekî milletê me û ji ber seruberê aborî û xweristîya jiyana me ya sade, zelame xudê yê hebûnê, wergirtinê û xudanîyê (temellukê) ye di malê da û jinik xudê ya ciwanî û evîne û danê ye û ewe ye egerê hemî problemê jinikê. Li milletê me, wesa rolê jiyana hatîne

parvekirin ku, zelam bit xudanê emir û nehîya û jinik bit ya bin emir û guhdar, bê xeberîya kesê neket, ji mirovê malê û binemalê û heta xelkê biyanî jî, neguhdariya wê şermeka mezin û gunehaka mezintir, gelek cara me guhlêbûye, dayk û babba yê gutîye kiça xwe" tu ya aza nebî û ne tu çî ya meyê, heke tu bédilîya xeswî û xezwirê xwe û mal û mîrê xwe bikey" yan jî dîbêjin: "ew te şwîkir û tu çûye ser av û rizqê xwe, ne ku ew bit tu ji bin perê mîrê xwe derkeve û bédilîya wî bikey, ne ku ew bit tu rojekê ji roja lietka me bibey û bi ineyta silbûniyê qesta malbabê bikey", divê tu xwe bikey, erd û ax bo mîrê xwe". Û gelek nimonê di yê van şîreta, her çende van axiftina layê xwe yê başiyê jî yê hey, û nexasme bo pêkvegirêdana malê û nexasme di wî demî da, lê vê tîrsa olî û şerma civakî karekê mezin di kesatiya jinkê da kirîye, ew neçar kirîye ku bidete ser hemî hez û rihetiya xwe û van hemî tiştên bicih bin û li vê kesatiya me hwe dibit. Gelek jinik dibûne dayk jî, lê mafê xwe yê taybet nebûye ku bi dilê xwe zarokê xwe bitaşînin û xweşiyekê pê biben, mafê xwe wek dayk jî bibînin, ne bi tenê wek dayînek erkê wê yê serekî inana zaroka bit, da nîşê pê zêde bibit, yan jî wek amîrekî bo karubarê malê û xizmeta mirova.

Çiya Haco: ciwanek kurd di qada sportê ya navneteweyî de



Sîrwan Heçî Berko

Ji her tiştî nexweştir, xerîbî ye. Lê ya ku di xerîbîyê de dilê yekî xweş dike, ew e ku gava mirov serketinê bi dest dixê. Ango mirov bi vîna xwe kare vê rewşa nexweştir û awarte bi kar bîne û sude jê wergire û tîxe ciwa qezencên neteweyî.

Sport jî nemaye weku leystikeke sade, lê bûye siyasî û bazirganî jî. Loma gava ku nav bi leystikvanekî dikeve, dewleta wî û gelê wî lê xwedî derdikevin û serê xwe pê bilind dikin. Bilindkirina alên rengereq di qayîşên navneteweyî de nîşanên vî tiştî ne. Welatên pêşkefî bi milyonan ji dollaran di warê sportê de xerc dikin, da ku di qada navneteweyî de hejmareke mezin ji serketinan bi dest bixin.

Çiya Haco yek ji wan ciwanên kurd e, yê ku li derveyî welatê xwe bi ser ketine.

Çiya bi leystikbandy (floorball, goka di hundir de) dilîze.

Floorball leystikeke mîna goka li ser qeşa ye, lê zemîna leystikgehê ne ji qeşa pêk têt. Ev sport cara pêşî di sala 1981 de li Swêdê hate leystin. Di sala 1986ê de, dîsa li Swêdê Federasyo-

na Floorball a Navneteweyî hate damezrandin. Li seranserî cîhanê, dora 230 hezar leystikvanên qeydkirî hene. Ew di 3900 yane (klub) de li 34 welatan dilîzin. Ev sport bêtir li welatên mîna Swêd, Finlanda, Çik, Swêra û Nerwîc têt listin. Li gorî agahiyên Federasyona Floorball a Navneteweyî, li seranserî cîhanê hejmare kesên ku bi vê gokê dilîzin, bêtirî 1,5 milyon e.

Çiya 18 salî ye. Ew li bajarê Tirbesîpiyê li Kurdistana Suriyê jî dayik bûye. Hîn sê salî bû, malbata wî koçberî Swêdê bû û li bajarê Alfta (300 km dûrî Stockholm paytext) bi cî bûye.

Ji ber li Swêdê leystika goka li ser qeşê di listeya leystikên sportê yê din de rêza yekemîn digire, Çiya di zarokîtiya xwe de berê xwe da vê sportê. Lê piştî ku du caran lingên wî şiksetin, malbata wî ew jî wê leystikê bi dîr xist û berê wî da innebandy. Ev dora 8 sal in ku Çiya bi vê sportê dilîze.

Ji ber ku Çiya di vê sportê de ewqasî bi ser ket û, ew par jî bo beşdarbûna di tîma Swêd ya niştîmanî ya leystikvanên bîniya 19 salan de hate hilbijartin. Bi tîma Swêdê re, Çiya li Swêdê beşdarî pêşbirkeke navneteweyî bû. Derfetên wî pir mezin in ku ew piştî bikeve tîma mezinan jî. Çiya di rêza êrîşê de dilîze û di amadekirin û anîna golan de jêhatî ye.

Komek ji rojnameyên Swêdê li ser Çiya û serketina wî nivîsandîye. Serketinên wî di yaneya Alfta û herweha di

tîma Swêd ya niştîmanî de bûn sedem ku gelek yaneyên din ên swêdî çavên xwe bavêjin wî û bixwazin wî bikin yek ji leystikvanên xwe. Ûeş yane niha li bendî bersiva Çiya ne. Ger Çiya yekê jî wan hilbijêre, rewşa wî ya aborî jî dê baştir bibe û ewê gelek tiştan qezenc bike.

Çiya ne tenê di sporta xwe de serketî ye; ew herweha xwendekarek zîrek e. Ew niha xwendina bakaloriya (lîse) dike û çavê wî lê ye ku piştî li zanîngehê xwendina bilind bike. Piştî lîseyê, leşkerî têt. Çiya hîn nizane bê ewê pêşî biçê leşkeriyê yan di sporta xwe de berdewam bike. Bavê wî dixwaze ku kurê wî leşkeriya xwe bi paş xîne û xwe bêtir mijûlî sportê bike. Li Swêdê, mirov dikare ta temenê 27 salî biçê leşkeriyê. Weha diyar e, ku ger Çiya biçê yaneyeke din û derfetên wî li wir baş bin, ewê leşkeriya xwe bi paş xîne.

Ji bo ku Çiya di nav gelê xwe de jî bi ser keve, pêwîstiya wî bi zîmanê kurdî heye. Di axavtina bi zîmanê kurdî de, Çiya zehmetiyên dibîne. Di civata kurdî de ew yekê jê re bibe kelem, ger ew zîmanê xwe bi pêş nexîne. Serketina wî wekî Kurdekî li derveyî Kurdistanê de tamam bibe, ger ew vê kêmaniya xwe tune bike.

sirwan@amude.com

Li Bajarê Nürnbergê Rojên Çanda Kurdî



Alî Alxasî

Li Almanyayê, bajarê Nürnbergê di navbera rojên 9-17ê Nisanê de ji aliyê şaravanîya Nürnbergê û dezgeha Inter-Kultur-Büroyê Rojên Çanda Kurdî tê çêkirin. Di Rojên Çanda Kurdî (Kurdische Kultur Tage) de hunermend, nivîskar û resamên Kurd beşdar dibin. Amadekarê Rojên Çanda Kurdî û berpirsê Inter Kultur Bürooyê Jürgen Markwirth armanca xwe a li ser Rojên Çanda Kur-

dî weha anî zimên: Em bi salan kar û xebatên bi vî rengî dikin. Lê li ser çanda Kurdan ev xebata me a yekemîne. Me xwest ku bi Rojên Çanda Kurdî em renegekî din di nav çandên ku li vî bajarî hene pêşwazî Nürnbergîyan bikin. Jürgen Markwirth dixwaze di salên bînan de ji xebatên bi vî rengî bike. Lê ew niha li hêviya Kurd û Almanan ne, ku beşdarî Rojên Çanda Kurdî li Nürnbergê bibin.

Program:

Destpêk 09.04.05 Şemî: Koma Çar Newa, Mikail Aslan

10.04.05 Yekşem: Vekirina pêşengeha hunermendan Schakar Hamalov û Ismail Atmali

13.04.05 Çarşem: Film, 'Vodka Lemon' Derhêner Hiner Saleem. Film li ser jiyana kurdên Ermenistanê ye.


15.04.05 Înî: Guftûgo li ser Dîrok û dahatiya Kurdan, axaftvan Prof. Ferhad İbrahim, Mehmet Bayrak û Mehmet Uzun. Moderator Lale Yalçın Heckmann

16.04.05 Şemî: Konser, Metin-Kemal Kahraman

17.04.05 Yekşem: Edebiyata Kurdî, Doh, İro û Sibe. Axaftvan Mehmet Uzun

alxasi@gmx.net

Bûyera 33 gule dibe fîlmek dokumenter



Nivîskar û rojnamevan Gunay Aslan bûyera ku ji aliyê rayagiştî wek „sî û sê gule“ tê naskirin, dike fîlmek dokumenter. Weke tê zanîn di sala 1944an de li navça Ozalpê 33 gundiyan Kurd ji aliyê eskerên Tirkan ve bê sebeb hatibûn kuştin û di derheqê mêrkujan

de heta îro ji tu tehqîkat ne hatîye kirin. 33 gundi nêzî sînore Kurdîstana İranê li newala Sefo ji aliyê komek eskerê di bin fermandariya general Mustafa Muglali de hatibûn qetilkirin.

Qeder, neheqî û aqil - 1 -

Bargiranê OMERÎ

Hebûna însên bi bûyina ji dayikê re dest pê nake û bi tu mirina naqede. Her insan berî gelek hezar sala, ji heyamê berê de, li gora qanûna xulqetê bi liba bizirê giyanê xwe ji bihiştê derketiye (li serî tu şiklê wî tunebû û tu hiş pê nehatibû) û bidûre gelek hezar sala di nav axa wê dinyayê û axa wê dinyayê de hatiye çandîn û hin bi hin ketiye şiklekî. (Ew herdu axên go hercar bedena wî jê çêdibin û go giyanê wî wilo di nav de tê çandîn, ew ax, ew madde di bin bihiştê re nin)

İnsan (nefsa herkesî) gelek cara tê nav axa wê dinyayê û derbasî nav axa wê dinyayê dibe, hetanî go rojekê (wek çaxê hilanîna zada yan çinîna fêkiya) baş bistewe (bikemile) go karibe bi canê xweyî go ketiye şiklekî û bihiş xwe hatiye, xwe li ber himmeta (zora) şewqa bihiştê ya xurt (bi hinner) bigre (go li ber wê şewqa bihiştê ya bi qewet hilneweşe, ji hev hilneweşe). İca gava mero li wê dinyayê û li wê dinyayê heyata xwe dibêre, mero bi serbestiya îrada xwe, bi reza dilê xwe, herroj, her seet meyla xwe (hilfa xwe) bibe ser çî tiştî, bixwaze pêjna çî tiştî bike, li ser çî tiştî bifikire, çî karî bike, emelê mero yê wilo tevde, wek bizirê go mero li nav zevikê bireşîne (li nav bexçakî têxe bin erdê, biçîne) li nav axa herdu dinya tê çandîn. Wek şitila, derxika yan tayê zada, emelê mero ji li nav axa zarîf (sivik, esirî, eterî) zîl dide, şîna dibe, mezin dibe, xurt dibe, piştî zemanê distewe, dibe fêkî (dibe qeder) û li mero vedigere (Ev weqîta emelê mero di kitêba heyatê de tê nivîsandin, yanî di kânatê de dişikile).

Meqse da hatina însên go gelek cara tê ser ruyê erda wê dinyayê ev e: Jibona emelê xweyî go hîna ne baş e, serrast bike, bedêla sûcê xwe (deynê sûcê xwe) yê zemanê berê bide, her bi her çêtir bistewe, bikemile. Her cara go insan dîsa tê ser ruyê erda wê dinyayê, perdeyek li ber çavê wî ye jibona go bi emelê xweyî berê yê xirab nizanibe û karibe xwe hin bi hin ji bin barê emelê xwe xelas bike û gav bi gav bi riya xwe de biçê. Feqîrî, fêmkemî, nexweşî, qede, bele û hertîştê din, pêşya

pêşî ji dest emelê mero yê zemanê berê tê serê mero. İnsan hay ji xwe tunene, di hindur nefsa xwe de pê ne hisyane bê aqil ji wana re bûye çî bela mezin, çî zihayê marê bi jehr go ji riya xirabiye bûye hacetek berberiyê. Xizmetkarê tarîtiyê zikreşiyê dixin dilê insanan, bi êqil û qapaniya wana, wana berdidin hevdu. Aqil însên dixapîne, wîjdanê wî, dengê nava wî dibilîne, dibêje xelkê din tenê sûcê qedera wî ne.


Lê belê wexta insan karibe êqil bisekinîne, fikrê xwe bibilîne, wî çaxî kare bi dengê nava xwe û bi wîjdanê xwe pêjna tiştan bike, bi dilê saft bête ser riya rast û xwe bighîne heqîqetê. Aqil ji axê (ji maddeyê) çêbûye. Gerek aqil wek hacetekî tim di xizmeta giyanê însên de ba û tim bi dengê nava însên bişixulya, xwe bi xwe tucarî neşixulya, tucarî nebûya wek pûtekî (semenekî) û neketa şûna dengê nava însên (şûna wîjdanê însên)!

Gava go giyanê însên xwe li riya rast (riya qanûna xulqetê) sist dike, rast nalive, guh nadê dengê nava xwe, pêjna tiştan nake. Gava paqîjiya meqsed, niyet û fikrêd xwe, paqîjiya dilê xwe tim nasitirîne û li heqîqeta go naskiriye tim ne miqateye. Li ser mesela paqîjiyê û heqîqetê tim ne şiyar e; bi bêhntengî, zikreşî û fikrêd lewitî hişê xwe girikî dike, edem dike, di nav mij û moranê de fêhmê xwe, zanibûna xwe, hişê xwe xera dike, xwe gêj û şaş dike. Serbestiya girandanê ji dest xwe dibe û wilo dispêre aqlê xwe go wa wilo dike, xwe bi vî hawî dixê bin hikmê aqil (xwe dike hêsiyê êqil). Dengê nava xwe, pêjna li nava xwe, dengê giyanê xwe dibilîne (difetisîne), ew giyanê go eslê wî ji bihuştê hatiye û bi vî şertê go li gora qanûna xulqetê bimeşe (go tu kesî, tu tiştî di ser xwedê re negre, xisarê û neheqiyê li tu kesî neke, tu kesî neêşîne). Bi vî şertî, taca nemirinê, taca zindimazîna timûtîm (hetanî ebedê) jê re hatiye ahd û wead kirin; îcar ev giyan qirardana xwe (îrada xwe), heyata xwe dispêre êqil û fikrêd êqil xwe dike nav lepê êqil, dike bin destê êqil, wî ji xwe re dike wek pûtekî. Li ber sicûde dibe, li ber wî aqilê go eslê wî ji mejî, ji axê çêbûye û wê rojekê talî birize û bibe ax.


Weşanxaneyê Dozê sê pirtûkên nû derxist



Beşê duyem a pirtûka Birêz Mesud Barzani di Sibate de dîsa ji aliyê Weşanên Dozê ji bo xwendevanan hat pêşkêş kirin. Ev beş nêzîkî 600 rûpelî ye û ji serhildana sala 1961ê dest pê dike. Bi pirtûka yekem ji dîroka Barzani yê nemir ya heta serhildana 1961ê ji bo xwendevanan hatibû eşkere kirin.



Pirtûka Hasan Yıldız a bi navê "Yekîtiya Ewropa, Tirkîyê û Kurdî" 184 rûpelî û di Çileyê Pêşîn a sala 2004an de ji aliyê Dozê hatiye weşandin.



Ev pirtûka Etem Xemgin di Çileyê Paşîn a sala 2005an de ji aliyê Weşanên Dozê hatiye weşandin û du sed rûpelî bêtir e.

Hûn dikarin van pirtûkan ji „Peyama Kurd“ bi dest xînin. eMail: info@peyama-kurd.com

Rojnameyanî Turkiye de Kitabî Hîtler

Nur Celalî

Çend hefteyo rojnameyanî Turkiye de, nuştoxî derheqî kitabî Hîtler de nusênî. Her çî bi xeberê rojnamê "Akşam" dest pê kerd. Nê Rojnamî bi spotî "Aver şiyayîşo tehlikeyin (tehlikeli gelişme)" nuşt ke kitabî Hîtler Lejê Mi (Kavgam) biyo bestseller; miyanî kitabani zaf roşayan de, biyo kitabî pancin.

Badî na xeber, hem Turkiye de hem zî teber de no derheq de zaf nuştê nusiyê. Financial Times de Vicent Baland nuşt, "Xortî Tirkan qey Hîtler mereq kenî" û qerqilyayîşî Serekê Cemiyetê Musevîyanê Tirk ra behs kerd.

Turkiye de, rojnamê "Akşam" ra Ümit Özdaş nuştê xo de persa: Kam Hîtler kam wuneno û qey wuneno? Cevabî persê xwî hunê yi da. Özdaş vanu, "Hitler kitabî xo de behsê komployo ke badi herbê dinyaya yewin pêşiya sarê Almanya keno û sey sebebê nê zi Yahudîyan



vineno. Hitler vanû ke Yahudîyan ma pê ra xîçer kerd.

Özdaş gore wendoxî kitabî Hîtler Tirkî holi (iyî Türkler) û waharî tehsilo berzî. Qey sebebê wendişî zî vûnou; "Her çend vera rexistina terorist serfira-

zî bî la dima rexistina terorist çî waşt, amê ca. İnan zi tahamul Tirkani holan qêdna. Tirkî hol vûnî; "ma pê ra amê xîçer kerdiş".

Nuştoxî gore no rayer şaş o, çarê Hîtler, bingehê „Ne mutlu Türküm diyene“ de milliyetperveriya Tirka ya.

Na xeber û pêşniyazî ê zaf nuştoxî tersnê ke piye dima "Yeni şafak" ra Kürşat Bumin, Ahmet Kekeç, "Milliyet" ra Can Dündar, "Radikal" ra Haluk Şahin, "Tercuman" ra Gülay Göktürk vînayê xo nuşt. Nê nuştêyan de ters û qerqilyayîşî tiyemîyan dê o. Heta Gülay Göktürk persena; "Gelo kitabî Hîtler qedexe(yasak) bibo yan nê?"

Gelo kam raştâ?

-No yew reaksiyono verba ABD û İsrail o?

-Bombayekî newe ha viraziyena?

Gef û Tehdîtî Psîkolojîkî

Hespî Aydın

Nê çend aşmî ke gefî Tirkan Kurdistana Başûr ser de .kêm nêbenî. Panciyes seri estî ke dewleta Tirk tehmedî sazbiyayîşî hukmatî Kurdistana nêkena. Kurdanî Başûr zi welatî xo de yew idare yo nimune nawo rue. Dostî û duşmenî zi pê demokratîk û sosyal terefî no hukmata qal kenî. No idare sey biharî rojhilata binatin yeno sinasnayîş.

La dewleta Tirk her daim gefan wine-na nê Kirdan ser. Zaf ray zi gerilayî PKKî kerdibî mehne û hicûm berdibi heq-huquq nê hukmatî ser. Ewro roj zi Kerkûk yan zi ilan kerdişî dewleta Kurd kenî mehne, xo de heqî midahaleyî Kurdistana Başûr vînenî. Senî ke ma çîşkeke de kayî piyerdariş de embazi per bîn tersnayan û lingê xo dayni erd re; vatîyen: Xum kena, gum kena, ez yena, to wena

Dewleta Tirk zi sey İran û Suriye nêwazena ke Iraq de yew îstikrar bibo, yew dewleta demokratîk û federe rue-niyo. Tirkmenan verba Kurdan kiş kena. Zaf ray torî İran û Suriye piyesserameyîşan virazena ke ke Kirdan heqenî xinan re mehrum verdî û nêverdî ke Kurd dewleta xo ya xoser sazkerî. General û serokwezîrî Tirkan nê rojanî peyinan de gef ser gef winenî. Nê.Piyer semedî statuya Kerkûk û azadiya Kurdistana Başûr ê.

Qalî sey: „Kerkuk ma rehetsiz keno“, „Ma misade nêdanî ke ço ma berehet bikerô“, „Hesasiyetî ma estî“ yan zi seyî „Nasnameya Tirk her kesî re besa“, „Yew roj şertî biyerî ca ma heqî ma beno ke ma Musul îlhak bikir“ û sey İnan fekî mesulanî dewleta Tirk re nêkuenî.

Yew per ra zi İmralî ra nê gefanî tirkan re ardim yeno. Uca re zi qalî sey „Iraq de dewleta siyonîsta didin ha saz bena, şîma (devlete tirk) ewro roj tedbir megir a siba bena belawo gird“ „Kerkûk û doletî ya ey kot Kirdan dest, hin ço nêşkeno İnan vindarno û ê rojhilata binatin de benî taluke yo gird“ yenî vatîş.

La hetî Kirdan ra zi Barzanî û Talebanî

pê demecanî xo ya diqatî mesulanî Tirkan ûncenî ke, meseleya Kerkûk û xoser biyayîşî Kurdistana meseleyê zerrî yê û ê teber ra midahale nêwazenî. Birêz Talebanî vano:

Ma qet Kerkûk ra nêvereynî.

Birêz Barzanî ziverba gefan û tehditanî Tirkan beyanati dano, vano:

Mi çî ray zi xoser biyayîş Kurdistana sey hûn nêdiyo, gelê Kurd yew netewe ya. Sazkerdişî dewleta xoser semedî Kirdana eyb niyo, heqî Kirdano.

Tirkan no asirî vîstan de heq û huquqî şarî Kurd, nasname û kulturî Kirdan tam kerdo qedexe û bi zilm û tehdaye her sere berzkerdişî Kirdan pilixnawo. No sebeb ra nêwazena ke statukoyî rojhilatabinatî bibedilyo. Tirk azadbiyayîşî Kurdistana Başûr ra tersenî, çimkî ê zûnî ke yew roj dor yena İnan zi. No rid ra zaf benî har û kuenî macerayan dima. Per bîn ra Tirk wazenî ke petrolî Musul û Kerkûkî bigirî xo dest.

Duşmenanî Kurdan tarîx de him pê çekana Kird kişî, himzi dayî yew bînan kişî. La wext ke nêşkayî pê çekana zîwar-zulmî dom bikerî, o wext zi dest eşto zur û iftirayan.

Ewro roj zi ê wazenî ke biratê û ardimî Kirdanî Bakûr semedî Kirdanî Başûr çine bikerî û ihtilaf miyanî İnan de pêda bikerî. Mesela vûnî ke „Amerika ha Iraq de bisilmanan kişena“ yan zi „Kirdî Irak de eşîrî, feodalî“.

Tirk na politikaya xo zi nemnomite miyanî şar de rûnenî. Çimkî ê Amerika ra tersenî.

Yew per ra dewlet, per bîn ra zi İmralî wazenî Kurdanî Bakûr manipule bikerî. Kî gon na proses weş fam bikerô û ey gore midahaleyî no prosesî bikero.

Eyay ra yew perî tekoşîn zi tekoşîna pisikolojîk a. Ewro roj ma Kirdan re her dem ra zaf yewbiyayîş, xorexistin kerdiş, hîşarbiyayîş û rayero millî lazom o.

Gereka Kurd TV, rojname û radyoyanî xo de şarî Kurd û dinya nê politikayan ser agahdar bikerî.

Sarican de hezaran bi coş Newroz firaz kerd



Sarcan - Partiya maf û Azadiyan dewê Depi Sarcan de bi hezran dewija piya Newroz firaz kerd.

Raya yewina ke Sarcan de İna Newroz yeno firaz kerdiş. Newroz verî belediya de bi wekerdişî adira amê firaz kerdiş. Dewijan derûdûmarê adir de govend girot.

Serekî HAK-PAR ê Sarcan Ali Şahinoğlu İta Newroz û tekoşînê Kurdan ser qisêkerd.

Cuwa pey idareciyanî partî ê sarcan re Yasın Bataray qisêkerd. Yasın Bataray va ke tekoşîna azadî û serxwebûna ke ser-ran cuwa ver İta de Ramazan Adiguzel û embazanî ey dest ci kerdib, ma na tekoşîn rûmnenî.

Newroz bi bernamê muzik û govenda 4 sehet rumit. Dewijî dûmarî zi semedî Newroza amê Sarcan

Amed de yew qahwexanê cînîyan bi a



Amed- Heftekû vîyert Amed de bi namê "Rûj" yew qehwexanê cînîyan bi a. Waharî nê qehwexanê Sevgî Guzelek (31) merasima akerdişî de semedî rojnamewanan yew eşkirakerdiş kerd vila û va ke aye çend serî mumesilîyê dermanan kerda û perê xo dayî ariye ke yew cayo İna akîro.

No qehwexanê de cînî yenî piyesser sohbet kenî û eşkenî kayanî sey okey, qaxet û tewle kaybikerî.

Turîstan kerd xo bin



Selim Çürükkaya

Ewro mi yew embazê xo de pê MSN qisêkerd. Embazê mi Ebukata û Enqere de nişena rue. Mi veri hal - xatir aye pers kerd, aye va:

Ez zaf hola, misafir mi estî, ma hê ruenistê.

Mi va:

Misafirî to kami?

Aye va:

Kirdî şimawo, dozgerî Tirkan

Mi va:

Meselayî al se biy?

Aye va:

A mesela yew gendib(kompo).

Mi va:

Ax nikey perê mi bibin

Aye va:

To se kerdiyên?

Mi va:

Mi beyraqê Tirkan re tumanî virastiyan û rotîyen. Ingilîzan, Amerikayîyan, Almanan ê tumanî kerdiyên pay û ûmenî İzmir, Antalya, Marmaris û şîni plajan. Polesî Tirkan dîni ke turistan alê İnan kerda tuman; ê yers bîni, ti-fingî xo girotiyan û hethetî turistan ra geyraynî.

